Azadiya
# WELAT
Rojnameya Hefteyî
SAL: 3 127
4-10 tîrmeh (Temmuz) 1998
BUHA (Fiat) : 150.000 TL
ISSN 1301 7497

## *Gelên li Çukurovayê dewlet protesto kirin*

# Erdhej li vir e, dewlet li ku ye?

Erdhejê li kedkarên Edeneyê xist. Rayedarên dewletê, wekî her car çûn cihê bûyerê pesna dewletê dan, lê piştî ku çûn tu alîkarî negihîşt gel. Lewre jî li gelek cihan dewlet hate şermezarkirin. Li hin cihan jî, dewlet di dema veşartina cendekan xwe nîşan dide.

Cendirme nahêlin ku berî hatina dozger û pêkhatina otopsiyê cendek bêne veşartin. Dîsa li gorî agahiyan cihên ku lê alîkarî tên belavkirin, bi piranî cihên faşîst û dewlemendan in. Di belavkirina alîkariyê de jî saziyên dewletê dubendiyê dixin nava gel. Rpl.3



## Koma Antîfa ya Almanyayê:




# Doza li dijî Eva Juhnke siyasî ye

Niha ne karîger be jî, di navbera dewleta Alman û PKK'ê de hin têkilî hene. Çawa li Tirkiyeyê qanûna 168'an endamtiya rêxistineke nehênî heye, li Almanyayê jî qanûna 129/a heye. Ew jî li ser endamtiya rêxistina nehênî ye. Gelek kes hebûn ku ji vê qanûnê dihatin darizandin. Lê ji ber peymana di navbera PKK'ê û dewleta alman de gelek kes serbest hatin berdan. Rûpel.8-9

Lêkolîn: Dîrok, bêjeya kurd û wêjeya kurdî (II) – Rûpel 4
Mehmet Can Yüce: Hevrê û fermandara min Sema – Rûpel 6
Nûçe: Rêçikê vilika welatî yê benê derg– Rûpel 15
Zarok: Bijî lîstik, Bijî Welat – Rûpel 12
Osman Özçelik: Rola Dadgeha Ewlehiyê rpl.5
Hasan Kaya: Çukurova: Bêndera gelan rpl.13
Bekir Şiwanî: Komalkujî spî rpl.11
Mirhem Yiğit: Dengvedana şoreşê li Swêdê rpl.7

## Azadiya WELAT



SAMÎ TAN

# Êrîş piralî ne, divê berxwedan jî piralî be

Şerê ku li welatê me didome, di gelek waran de tê meşandin. Beramberî her gava Tevgera Azadiyê, hêzên dagirker jî dest davêjin hin bergiriyan. Di her warî de çend proje bi hev re tên dimeşandin. Armanca bingehîn qirkirina spî ye. Lê heke nikaribin bigihêjin doza xwe, dikarin kurdayetiyê wekî nasnaveke rajêrîn bipejirînin. Heke di vî warî de jî bi ser nekevin, îcar "çareseriya bêyî PKK'ê" tînin rojevê. Her tişt girêdayî hêz û xebata gelê kurd e. Heke gelê kurd xebata xwe baş bimeşîne, hewl û xebatên dagirkeran di avê de bibe, bidestxistina azadiyê jî pir nêzîk e.

Her wekî çawa ew dixwazin, gelê me bi rêbazên cur bi cur qir bikin, em jî lê dixebitin û bandora jehra bîrdoza dagirkeran tune bikin, bandora şoreşê zêdetir bikin. Her mala ku weşanên doza azadiyê têkeve, bîrdoza mêtingeran nikare ji xwe re tê de cih û mefer bibîne; nîjadperestî, tirkperestî, kevneperestî û mêjokdarî, wekî tariya ku li ber tirîşkên rojên belav dibin, ji navê radibin.

Ji ber ku dagirker jî vê yekê baş dizanin. Bi rêbazên cur bi cur li ber belavbûna ronahiya rojê, dixwazin çeperên tarîtiyê deynin. Car dibe bi terorkirin û kuştinê, car dibe bi desteserkirinê, car dibe bi sansûrkirinê karê xwe dimeşînin. Piraniya saziyên fermî û gelek saziyên arizî di xizmeta vê xebatê de ne. Jixwe cuntaya 12'yê rezberê ji bo ku kontrola dagirkeran li ser hemû saziyan ji sedî sed pêk bîne, hate ser kar. Ji ber vê yekê hemû sazî ji kesên welatparêz û demokrat hatin paqijkirin; hê jî her sal bi dehan kes ji van saziyan têne avêtin.

Îro her çiqas bi geşbûna tevgera karmendan re, bandora dagirkeran li ser hinek saziyan lawaz bûbe jî, kontrola dagirkeran li ser saziyên fermî xurt e û bi zagonên nû dixwazin vê bandorê zêdetir bikin.

Saziyek ji wan jî PTT ye. Îro ji bo belavbûna weşanên dijber, poste xwediyê risteke girîng e. Dema tiştê ku mirov dide posteyê negihêje cihê xwe, demê mirov gelekî tengav dibe. Wekî hemû weşanên dijber, em jî di vî warî de gelekî zehmetiyan dikişînin. Rojnameyên ku em dişînin derve nagihêjin cihê xwe û nameyên ku ji me re tên şandin, nakevin destê me. Bi taybetî dema rojname nakevin destê aboneyan, baweriya wan a bi me lawaz dibe û ew jî dibe sedem ku hejmara aboneyên me kêm bibe. Jixwe armanca dagirkeran jî ev e ku weşanên dijber bi vî rengî bixin nava tengasiyê û têkiliyên wan bi derve re lawaztir bikin.

Her wekî me li jor jî da xuyakirin, ev şerekî piralî û roj bi roj e, lewre em li hemberî van tiştan serî natewînin û emê li ber xwe didin. Daxwaza me ji aboneyên me ev e ku vê lîstika dagirkeran bibînin û wê lîstikê di avê de bibin. Ji ber vê rewşê hêvîşikestî nebin, dev jî abonetiyê ber nedin. Her abonetiya nû şimaqek e li rûyê dagirkeran. Her wiha bi zêdebûna aboneyan derfetên pêdekirina riyên nû zêdetir didin.

**Ev şerekî piralî û roj bi roj e, lewre em li hemberî van tiştan serî natewînin û emê li ber xwe didin. Daxwaza me ji aboneyên me ev e ku vê lîstika dagirkeran bibînin û wê lîstikê di avê de bibin.**

# Şehîd pergaleke nû dixe xizmeta mirovahiyê

ABDULKERÎM TEKİN
R. EHMED HESEN

Çîn û neteweyên bindest gava ku nirxên xwe neparêzin, lê xwedî dernekevin ne gengaz e ku di nava malbatên civakan de cihê xwe bigirin. Ji bo ku mirov di nava malbatê de cihê bigire, pêwîst e ku mirov naveroka cewherê jiyana xwe biparêze. Bi taybetî ku gelek cewherê xwe yê jiyanê neparêze nikare li nirxên xwe yên birûmet jî xwedî derkeve.

Nemaze ku nirxên gelekî winda bûn, yan jî hatin jibîrkirin, wê çaxê mirov dikare bêje mirin jê re nêzîk dibe. Ji ber ku jibîrkirina nirxên birûmet mirina wî gelî bi xwe ye. Lewre di vir de hêvîbariya xeyalên jiyaneke birûmet pir lewaz dibe. Ger bawerî û hêvî lewaz bû, wê çaxê hebûn û tunebûn jî xwe dide der. Gava ku hêvî mir, wê çaxê welat, çand, rûmet, haysiyet, huner û nirx jî ji holê radibin. Wê gavê mirov dikare bibêje her tişt bi hêvî û baweriyê ve girêdayî ye. Ev yek bi mêjî ve, bi dil ve û bi giyanê ve girêdayî ye.

Di vê pêvajoya pêwîst de gelê me îro bi fedakariyên mezin nirxên xwe yên birûmet diparêze. Lê çiqas gelê kurd heyanî beriya dîroka Partiya Karkerên Kurdistanê nirxên xwe yên birûmet neparastibin jî, ev yek her gav di serî û mêjiyê wî de veşartî mabû. Lê belê ev veşarbûna han bi tevgera azadiyê re roj bi roj der dibe, bi dagirkeran de diteqe û tola zarokên Agirî û Welatê Rojê û nirxên birûmet ê ku veşartî mabûn hiltîne û celebekî nûjen derdixe holê. Ji bo gelê me nirxên herî mezin û birhumet, mirovahî bi xwe ye. Di nava vê mirovahiyê de yê ku cihê herî bilind û mezin girtiye, şehîd bi xwe ye. Ji ber ku şehîd di helwesta xwe ya şoreşgerî de pergaleke nû û pêşverû di xizmeta mirovahiyê de derdixe holê û dide damezirandin. Ev damezirandin bi ked û fedakariya şehîdan a ku di riya mirovahiyê de ji bo doza gelê bindest canê xwe didin û pêşgengiyê dikin û dibe ronahiya herî mezin ji bo jiyana mirovatiyê.

**Şehîd bi helwesta xwe ya şoreşgerî di xizmeta mirovahiyê de pergaleke nû dide damezirandin. Ev damezirandina bi ked û fedakariya şehîdan ku ji bo doza gelên bindest canên xwe didin, ji bo jiyana mirovatiyê ye.**

Jiyana nû, ya ku şehîd bi livbaziyên xwe ya rêkxistî derxistiye holê, helwesta herî mezin a li hemberî kevneşopî û dagirkeriyê ye. Ji ber ku şoreş, bi bi lehengiya şehîdan û ramana wan a zanistî tê avakirin. Ronahiya herî mezin ronahiya şehîdan bi xwe ye. Ji ber ku şehîd navê nirxên mirovahiyê ye. Ev nav wekî lehengiya Mazlûm, Kemal, Zîlan, Bêrîvan, Bermal, Rewşen û hwd. vejîn û berxwedana wan cewherê jiyana nirxa mirovahiyê ye. "Partiya Karkeran partiya şehîdan e." Ji ber ku tevgera azadiyê ye, hêza xwe ya herî mezin ji jiyana şehîdan digire.

Jiyana şehîdan ronahiya çavkaniya jiyana mirovan bi xwe ye. Jiyana şehîdan bi xwe hêvî ye, mêjî ye, raman e, giyan e, vîn û hêza ronahiya jiyanê bi xwe ye.

Bi rastî dîroka gelê Kurd bûye dîroka şehîdan. Dîroka şehîdan felsefeya ronahiya jiyana şehîdan bi xwe ye. Felsefeya jiyana şehîdan ronahiya jiyana mirovahiyê ye, azadî, serfirazî, yekîtî û rizgarî tê de heye. Ev yek îro di tevgera azadiyê de xwe dide xuyakirin. Gelê me di bin van mercên zor û zehmet de bi fedakariyên mezin li şehîdên doza mirovahiyê xwedî derdikeve. Lewre gelê me hêza xwe ya herî mezin ji şehîdên xwe digire. Ala şehîdan a ku bi berxwedan û lehengiya xwe bilind, kiribûn, gelê me jî vê yekê bilind dike û li banga wan xwedî derdikeve.

Banga şehîdan ji xwe re bingeh digire. Je ber ku riya serkeftinê di banga şehîdan re derbas dibe.

## Ferhengok

**aheng:** merasîm
**arizî:** taybet (özel)
**babet:** mijar, mewzû
**baregeh:** meqere, kamp
**beramberî:** karşılık
**bihuşt:** cennet
**boçûn:** dîtin
**cudahî:** ferqiyet
**cur bi cur:** çeşit çeşit
**çêr:** sixêf, dijmîn
**çawanî:** wesif
**dadgeh:** mehkeme
**dadger:** hakîm
**dahûrandin:** tahlîlkirin
**danişîn:** duruşma
**dansal:** demsal, werz
**dêmar:** jinbav
**diyarde:** kirû (olgu)
**dojeh:** cehennem
**dorvegerî:** dönüşümlü
**dozdar:** davacı
**ekl:** çêj, tam
**gilîr:** têrnegihiştî
**hosa:** wisa
**hencirîn:** eciqîn, perçiqîn
**hilawestin:** dardekirin
**karîgerî:** bandor, tesîr
**karmend:** memûr
**katjimêr:** demjimêr, seat
**laz:** kêlî, bîsk
**layengir:** alîgir, terefdar
**lewitandin:** qirêjkirin
**navgîn:** alav, hacet
**nexşe:** xerîte
**no:** tûj
**mafdar:** biheq
**mebest:** niyet
**mital:** xem, paxav
**mixabin:** maalesef
**mitêl:** nivîn
**pêşangeh:** sergi
**pirsyarkirin:** sorgulamak
**rewt:** çoyê dirêj
**rêbaz:** azîne, metod
**rist:** rol
**serdem:** heyam (dönem)
**sernigûn:** serberjêr
**şêwirmend:** danışman
**tajan:** ricifîna ji ber janê
**taloqkirin:** ertelemek
**têgihiştin:** fêmkirin
**tisî:** yavan

www.arsivakurdi.org

## Ji birayê Yücel Özen, Dursun Özen daxuyaniyên balkêş:

# Wêne û delîl hene girtin nîn e


"Min wêneyê birayê xwe yê piştî îşkenceyê li Nexweşxaneya Taksîmê kişandin. Birayê min sê polîsên ku îşkence lê kiribûn bi dizîka li nexweşxaneyê nîşanî min dabûn. Polîs bi vê yekê hesiyan. Ji bo ku wêneyan bi dest bixin bi ser bûroya parêzerê birayê min Ömer Kaya de girtin.Ez tehdît kirim. Encama dadgehê çi dibe bila bibe, ez ê serî li Dadgeha Mafên Mirovan a Ewrûpayê ê bidim."

Yücel Özen (26) di sala 9.11.1991'ê de ji aliyê polîsên girêdayî Emniyeta Beyoğluyê ve danê êvarkî tê binçavkirin. Yücel Özen Dêrsimî bûye û berî vê bûyerê hîç neketiye binçavan. Ji ber nasnava xwe ya neteweyî wekî endamê hin rêxistinan hatiye dîtin. Li Emniyeta Beyoğluyê îşkenceyên gelekî xedar li wî hatine kirin. Polîsan piştî ku nikaribûne li gorî dilê xwe agahiyan ji devê wî bigirin, ew şandine TEM'ê (Şaxa Têkoşîna Li Dijî Terorê). Roja duyemîn êvarî birayê wî Dursun Özen bi bûyerê dihese û diçe TEM'ê. Ew rewşa birayê xwe zor nexweş dibîne. Li ser daxwaza birayê wî, Yücel Özen hiltînin Nexweşxaneya Taksîmê. Piştî ku rojekê li nexweşxaneyê dimîne, polîs têne nexweşxaneyê û wî dîsa dixin binçav. Di wê navberê de polîs doktoran jî tehdît dikin. Piştî ku cara duyemîn bi mirîtî wî hiltînin nexweşxaneyê, Dursun Özen wêneyê birayê xwe Yücel Özen dikişîne. Yücel Özen di wê navberê de berî jiyana xwe ji dest bide, sê polîsên ku îşkence lê kirine, nîşanî birayê xwe Yücel Özen dide. Ji ber nesekinîna xwînê, wî careke din ameliyat dikin. Berî wê jî Özen ji "pankreasê" xwe ameliyat bûye. Ew piştî ku çar rojan dibin tedawiya hûrbînî(yoğun bakım) de dimîne, di 25.9.1991'ê de jiyana xwe ji dest dide.

Roja 8'ê tîrmeha 1998'an danişîna doza ku malbata Yücel Özen li îşkencekaran vekiribû, hebû. Dadgeran ev danişîn wekî yên berî wê taloqî 22.9.1998'an kir. Tevî her tiştî diyar e, ev heft sal in ku doza Yücel Özen didome; polîsên ku îşkence lê kirine tên zanîn, rapora îşkenceyê ji aliyê doktor ve hatiye dayin. Wêneyên ku şopa îşkenceyê baş diyar dikin, ji aliyê Dursun Özen ve hatine kişandin. Ev tişt hemû li ber destê dadgeran in, lê belê dîsa jî ev doz bi dawî nabe. Ev yek ji bo eşkerebûna qirêjî û layengiriya sîstema hiqûqî ya Tirkiyeyê mînakeke berbiçav e. Ji ber ku Qanûna Memurî Muhakemîyat wan dipareze. Lewre vê qanûnê, fermana kuştin û nekuştina mirovan xistiyê destê karmendên dewletê. Balkêş e, ev qanûn di serdema dewleta Osmanî de, di sala 1913'an de hatiye danîn.

### Ji bo îşkenceyê dîtinê kurdbûna bes e

Dursun Özen, bûyera kuştina Yücel Özen wiha vedibêje:"Li gorî gotina birayê min, bi xortûmên îtfayayê ew dane ber ava bi şid. Ji hilawestina filistînê bigirin heta ceryandayînê îşkenceyên bi pergal lê hatine kirin. Ji ber ku torbeyên qûmê bi ser de berdabûn, parsû û pişta wî şikestibûn. Dîsa ji bo ku ceyran zêde dabûnê, navbera hemû tilî û pêçiyên dest û lingên wî bûbûn wekî rijiyê (komirê). Ji bo ku ew kurd bûye, gelekî bi ser de çûne. Her dem pirsên wekî: "Tu ji kîjan rêxistinê yî? Kîjan rêxistin pereyan dide we? Kîjan rêxistin we birêxistin dike?" pirsîne. Wêneyên ku min kişandine rûyê wan ê rastîn dide der."


—TUTANAK—

20/1

12.11.1991 Günü Saat 16⁰⁰ sıralarında Beyoğlu merkez karakolu idaresinden darp sonucu Taksim hastanesine Beyoğlu infaz edilince getirilen ve Hastanemizin II'nci cerrahi servisine yatırılan mustafa oğlu 1965 İstanbul doğumlu Yücel ÖZEN halen Bahse konu serviste Hayati tehlikesinin devam ettiği kaydıyla halen yatmaktadır.

Şahıs hala Şuurunun yerinde olmadığından konuşamamaktadır. Bu nedenle olayla ilgili ifadesi alınamamıştır.


Bu tutanak Beyoğlu C. savcısının (Cemal [illegible]) telefon emirleri üzerine tanzim edilerek imza altına alındı. 14.11.1991 saat 14³⁰

Yüksel Alıcı
Polis memuru

Emin Akkulak
Em. Bekçisi

Op. Dr. Kadir Okay
15567

Li aliyê din piştî kuştina Yücel Özen polîsan sê salan bi telefonê malbata wî tehdît kirine. Carekê jî çar erebeyên polîsên sivîl xwestine Yücel Özen li ber Mizgefta Navendî ya Çeliktepeyê birevînin. Dîsa li Taksîmê bi ser bûroya parêzerê Yücel Özen, Ömer Kara de girtine. Li wê derê jî armanca wan bidestxistina negatîfan bûye. Piştî van yekan di danişînekê de şahîdê bersûcan, Cîgirê Midûrê Emniyeta Stenbolê, li dijî dozdaran hin tişt gotine. Li gorî wî, ew wê demê Amirê Emniyeta Sütlüceyê bûye, ew li ser anonsa bêtêlê çûye Yücel Özen dibin çav de dîtiye, rewşa wî baş bûye. Li ser vê yekê Dursun Özen reaksiyonek tûj nîşan dide û ji aliyê 20 polîsan ve tê binçavkirin. Ji bo ku xwe pê baş bidin nîşandayin Muavînê Emniyeta Stenbolê çêrî polîsan dike û di anonsa xwe ya di bêtêlê de wiha dibêje: "Kîjan pûştî birayê me Dursun xistiye binçav. Ew çi bêje me mafdar e. Ji ber ku niha kezeba wî dişewite."



### K.T. jî nikare li ber serîlêdana min ya AÎHM'ê bibe asteng

Dursun Özen di berdewama daxuyaniyên xwe de diyar kir ku, rayedarên Komara Tirkiyeyê jî nikare li ber serîlêdana wî ya AÎHM'yê bibe asteng û piştre jî ev tişt gotin: "Li ber çavê her kesî xortekî 26 salî bi îşkenceyê tê kuştin. Eger dadgeh di vê bûyerê de bêrûmetiyê bike, ez napejirînim. Ew ê hesabê vê yekê her çawa be, bidin." Li gorî ragihandinan, kesên ku wê demê îşkence li Özen kirine, "şêrên" Berpirsê Giştî yê Emniyetê yê wê demê Mehmet Ağar bûne. Kesê ku bi leqebê Hortum Süleyman dihate nasîn jî serokê wan bûye. Ew kes jî Kevnemudirê Emniyata Stenbolê bûye. Yücel Özen bi pey agahiyên xwe radigîhine ku, ew nabêje wan li birayê wî îşkence kiriye, belge û wêne delîlên her tiştî ne û piştre jî wiha dibêje: "Mirin jî nikare min ji vê dozê paş bixe. Ew dê di girtîgehan de cezayê ku heq kirine bikişînin." Özen ji çapemeniya rengîn jî gilî û gazincên xwe dike û wiha dibêje: "Heke wekî rojnameger li ser rûyê erdê bi tenê Uğur Dündar û rojnameya Cumhuriyetê bimînin jî, ez tu agahiyan nadim wan. Lê hûn canê min bixwazin ez ê ji bo we feda bikim. Dündar ji min re got, ez bi van bûyeran re eleqedar nabim, Cumhuriyeta ku em ji berê de wê wekî welatparêz û demokrat dinasin, ji bo vê bûyerê nûçegihanek şandin bal min ku ji sedî yek gotinên min fam nedikirin. Ew bi xwe lal bû. Ez nakevim gunehê wî nûçegihanî, lê di vir de nêzîktedayîn giring e. Xwedê bela xwe bide wan. Ew hemû çepgirên dozfiroş in. Ew vê gavê ji Ülküciyan hartir bûne. Çeka kapîtalîzmê wan girtiye destê xwe û li me dixin."

Dursun Özen wekî dawî jî dîtin û ramanên xwe wiha diyar kirin: "Em kurd û tirk divê li mafê xwe yê jiyanê xwedî derkevin. Kes nikare bibêje hûn li vî welatî zêde ne. Ev welat bi saya bapîrên me hatiye avakirin. Ez êdî naxwazim li vî welatî îşkence, înfazên bêdarizandin û kesên windayî çêbibin. Bila rêz û rêçikên vî welatî em deynin, ne dewleta çeteyan. Ez dixwazim bi gotineke Ercan Kanar gotinên xwe biqedînim. Di kongreya ÎHD'yê de Kanar wiha gotibû: "Ez li dijî, bi îşkenceyê kuştina îşkencekarekî/e me." Ez jî di heman baweriyê de me, le belê ez ne li dijî înfazkirina îşkencekarekî ya di cih de me."

AZAD AVAŞÎN

www.arsivakurd.org

# Konferensa dîrokî ya Şerefxanê Bidlîsî li Berlînê

Înstîtuya Kurdî bo Lêkolîn û Zanist li Berlîn Konferansa Navneteweyî ya Dîrokî li ser Bîranîna 400 saliya Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî ji 1–3'yê gulanê li bajarê Berlînê, li Haus der Kultur der Welt saz kir. Di vê konferansê de nêzîkî 30 dîrokzan, profesor û pisporên dîrokî yên kurd û biyanî amade bûn. Em vê nivîsa ku di rojnameya "Kurdistan" de hatiye weşandin pêşkêşî we dikin.




Konferansa Bîranîna 400 saliya Şerefnameyê de bi nîqaşên xwe di warê ronîkirina gelşên dîroka kurdî de bû gaveke girîng.

**Roja 1'ê ya konferansê**

Li roja 1'ê gulana 1998'an li katjimêr deh û nîvê spêdê konferans bi peyva birêz Prof. Î. Şerîf Wanli ve hate vekirin. Wanli, bixêrhatina hemî mêvanan û zana û endamên konferansê kir û bal kişand ser rola dîroka Şerefxanê Bidlîsî û got: "Divêt em kurd li dîroka xwe xwedî derkevin û saziyên taybetmend bo béne avakirin.

Rûniştina duwê li katjimêr 11.30 dest pê kir, sê mamostayan mijarên xwe pêşkêş kirin.

*Dr. Cabar Qadir ji Holanda "Bîografya krîtîk ya Şerefnameyê û nirxandina wê", Dr. Thomas Sencler "Pêlbûna avahî û sînorên Mîrgeha Bidlîsê". Dr. di vê mijarê de li ser sê herêmên girîng û mîrgehên Axlat, Mer'eş û Xensê axivî, bi wêneyên zatelêtî û nexşeyan semînera xwe pêşkêş kir.

*Dr. Kemal Mîrawdelî "Şîrovekirina dîrokî di Şerefnameyê de" di vê mijarê de mamosta da xuyakirin ku Şerefxan mirovekî zana û ilimdar bû, lewma girîngî daye meseleyên neteweyî û dîroka miletê xwe nivîsiye.

*Dr. Mehdad Îzadî pisporê qanûna destûrî li Zankoya New Yorkê mijara wî bi navê "Jiyaneke dûr û dirêj bi Şerefxan re" bû. Di saet di yekê de ev semîner bi dawî hatin û dan û standin hatine kirin, ev rûniştina ji layê Dr. Nûrî Talabanî ve hate birêvebirin, dûv re behndan û firavînê dest pê kir.

Rûniştina sêyemîn ji layê Hêja Siyamend Wanli ve hate bi rêvebirin, li piştî peyva PKDW'ê Komîsyona Çand û Perwerdeyê li Parlemanê Kurdistanê Derveyî Welat ji layê birêz M. Emîn Pencwînî ve hate xwendin.

Peyva Akademiya Rojhilatnasiyê li bajarê St. Petersburgê hêja Ordîxanê Celîl li ser navê serok û redaksiyona Akademiyê xwend. Di vê rûniştinê de ev babet hatin xwendin:

*Dr. Îsmet Şerîf Wanli "Hizr û Pirsgirêkên Metodolojîk di dîroka Kurdî de".

*Prof. Dr. Celîlê Celîl "Etnografiya Kurdistan di dema klasîk de".

*Dr. Musa Kaval "Gotina dewlet li serdema klasîkû nû de".

Piştî ku ev her çar semîner bi dawî hatin, danûstandin hatin kirin. Li katjimêr şeşê êvarê rûniştina çaran dest pê kir. Ev rûniştin ji hêla hêja Dr. Musa Kaval ve hate birêvebirin. Çend mesajên ji bo konferansê hatibûn hatin xwendin.

Piştî xwendina mesajan Dr. Mehrdad Îzadî li ser kurdên Afxanîstan û Xoresanê di serdema Mîrgeha Bidlîsê de rawestiya û deverên kurdnişîn wekî Nexewan, Semerqend, Taşqend, Buxar, Kerebax û Aşqabadê bi nexşeyên dîrokî li ser slaytan nîşan dan. Piştre ev rûniştin qediya.

Rûniştina pêncan piştî xwarinê li katjimêr heştê êvarî dest pê kir. Du mamosteyan tê de beşdarî kir. Ev rûniştin ji hêla Necîb Balayî ve hate birêvbirin.

*Dr. Îvgena Vasalîva ji Zankoya St. Petersburgê mijara wê yekemîn "Çapa orjînal ya Şerefnamê bi farisî"bû.

*Dr. Jackline Musayeliyan mijar bi navê "Wergerandina yekemîn çapa Şerefnameyê bo zimanê kurdî ji hêla Mele Mahmûdê Bayezîdî ve" pêşkêş kir.

**Roja duyemîn**

Di roja 2'yê gulana 1998'an katjimêr 9.05'an de rûniştina yekemîn dest pê kir. Çar mamosteyan bi mijarên xwe beşdarî di vê rûniştinê kir. Ev rûniştin ji aliyê birêz Hüseyin Kartal ve hate birêvebirin.

*Dr. Xelîl Cindî "Mîrnişînên Êzîdî yên klasîk Şingar û Şêxan".

*Dr. Îvgena Vaselîva "Mîrgeha Botan li Cizîrê".

*Dr. Memun Ebdulkerîm ji Zankoya Parîsê "Dîroka navçeyên kurdan, di bin ronahiya akeolojî û wêneyên zatelîtî de".

*Dr. Musa Kaval "Mîrgeha Hekariya û mîrata Şanbo".

Piştî danûstandina li ser van babetan, navber hate dayin.

Rûniştina duyemîn li katjimêr 3.30 dest pê kir. Birêz Selîm Feratî ev rûniştin bi rê ve bir.

"Şerefname: Dewlet avakirin, sînor û serxwebûn".

*Dr. Ferhad Şakelî "Kultura kurdî di sedsala 16–17'an de".

Mijara dawîn di vê rûniştinê de ya Ebdulreqîb Yûsiv bû, bi navê "Şerefxan û Tabloyên Şerefnamê". Lê pispor û şarezayê arkeolojiya kurdî birêz Ebdulreqîb Yusiv ji ber mercên seferê nikaribû ji Kurdistanê beşdarî konferansê bibe. Lewre di cihê wî de Dr. Ordîxanê Celîl mijara "Elementên kultura kurdî di Şerefnamê û Serdema klasîk li Kurdistanê" pêşkêş kir.

*Teblîxa Dr. Emîr Hesenpûr ji Zankoya Toronto ji layê Ebdurehman Mizûrî ve hate pêşkêşkirin.

Rûniştina seyemîn di katjimêr 5.30 de dest pê kir. Ev rûniştin ji hêla birêz Dr. Ferhad Şakelî ve hate birêvbirin û sê mamosteyan tê de beşdarî kir.

*Dr. Reza Hemzelî "Sîstema dînî elewiyet û ehlî heq û olên kevnar li Kurdistanê."

*Dr. Ordîxanê Celîl "Efsane û çîroka Kela Dimdimê".

*Mamoste Nermîn ji Parîs "Bajar û şûnûwarên kurdî di raman û boçûna gerok û rojhelatnasan de, sedsala 13–19"an".

Di rûniştina çaran de ku ji layê birêz Dr. Kemal Mirawdelî ve hate birêvebirin de sê mamosteyan beşdarî kir.

*Prof. Dr. Martin von Brunessen "Diyardeyên kulturên bingehî û milkî li serdema klasîk li Kurdistanê".

*Dr. Thomas Sencler "Bîrewerên Seyahatnama Ewliya Çelebî li ser bingehên wan ên kulturî".

*Prof. Dr. Celîlê Celîl "Mîr Abdal ji Bidlîsê û dewlemendiya koşka wî".

Bi vê semînerê roja duyemîn a konferansê bi dawî hat.

**Roja sêyemîn**

Rojeva vê rojê li katjimêr -11.30'an dest pê kir. Ev rûniştin ji hêla Ebdurahman Mizûrî ve hate birêvebirin û sê mamosteyan tê de beşdarî kir.

*Dr. Mehrdad Îzadî "Kurdistan di serdema klasîk ya dawî de, li ser rêka armîsî û bazirganiya navneteweyî".

*Dr. Thomas Sencler "Li deşta Agirî Qesra Îshaq Paşa".

*Dr. Enwer Sultanî (teblîxa wî ji hêla Dr. Sencler ve hate xwendin)

Piştî van mijaran birêz Prof. Dr. Wanli çend raman û pêşniyarên xwe ji bo pêşvebirin û geşkirina dîroka kurdî pêşkêşî endamên konferansê kir. Piştî konferansê êvara roja sêyemîn ahengeke muzîkê ji beşdaran re hate pêşkêşkirin.

www.arsivakurdi.org

# Rêzimanê kurmancî

## - Wane 19 -

SAMÎ BERBANG

### Hoker:

Ji ber ku mijara hoker têkildarî rengdêrê ye, baştir e ku piştî rengdêrê li ser wê raweste. Çawa ku rengdêr navdêrê bi mirov didin nasîn, hoker jî lêkerê bi mirov didin nasîn. Ango awayê ku kar tê kirin, dem û cihê karê ku tê kirin, dide zanîn. Ji ber vê yekê ji hoker re hevalkar jî tê gotin. Bi giştî mirov dikare van cureyên hokeran wiha rêz bike:

1) Hokerên çawaniyê
2) Hokerên dem
3) Hokerên cih û bergehê
4) Hokerên pirsiyariyê
5) Hokerên mêjerê

### Hokerên çawaniyê

Hhokerên çawaniyê, giş di bingeha xwe de rengdêr in, lê çawaniya lêkerê nîşan didin. Bo nimûne, dema mirov dibêje; "Hevala xweşik, zû dimeşe.", li vê derê "xweşik" her wekî berê jî hatibû diyarkirin taybetiya "heval" bi me dide nasîn ji ber vê yekê jî rengdêr e. Lê dema em dibêjin; "Hevala me xweşik dimeşe." Li vê derê "xweşik" çawatiya meşînê bi me dide nasîn, lewre jî hoker e.

Mirov dikare li ser vê mijarê çend mînakên din bide:

*Çivîk bilind firiya.*
*Heval karê xwe bi rêk û pêk dike.*
*Birayê min navê xwe zû dibêje.*
*Pirsgirêkê rasterast bibêje.*
*Ez li bi lez ji vir dûr ketim.*
*Gundî hêdî dimeşin.*
*Ew heval pir tûj xeber dide.*

### Hokerên demê

Her wekî ji nav jî diyar e, ev cure hoker dema kar nîşan didin. Mirov ji wan hokeran derdixe ku ev kar kengî çêbûye. Dema mirov "Îro ez ji gund hatim." bibêje, "îro" di vê hevokê de hokera demê ye. Wekî mînak:

*Duh hevalê min hate vir.*
*Sibe ezê herim ba hevalê xwe.*
*Di meha gulanê de ezê bêm*
*Berêvarkî were cem min.*
*Roj bi roj doz geştir dibe.*
*Her gav tişekî derdixe.*
*Sal bi sal karê me ber bi başiyê diçe.*
*Roja duşemê ev bûyer qewimî.*

### Hokerên cih û bergehê

Navê vê cureyê jî taybetiya wê dide dest. Yanê ev cure hoker, cih û bergehê karê ku tê kirin, destnîşan dike. Bo nimûne gava yek bibêje, "Ez ber bi mal diçim" li vê derê "ber bi" bergehê hokerê nîşan dide û mal jî cih nîşan dide, lewre jî "ber bi" hokera bergehê û "mal" jî hokera cih e. Mînak:

*Ez bi wir de çû.*
*Ew diçe gundê me.*
*Mamosta ji dibistanê tê.*
*Ew stranan li tomargehê tomar dike.*
*Tu jî were hundir.*
*Ev derket derve.*
*Hinek bi wir de here.*
*Me çend kevir danîne ser hev.*
*Zozan û Sorgul li nik hev rûniştin.*
*Ew ji min dûr e.*
*Tu nêzîkî wî yî.*

### Hokerên mêjerê

Ev cure hoker mêjera karê ku tê kirin nîşan didin. Mesela, di hevoka "Karmend gelekî meşiyan" de "gelekî" hokera mêjerê, miqdara "meşînê" ango karê ku tê kirin, nîşan dide. Em ji wê fêm dikin ku ew kar heta kîjan radeyê çêbûye. Lê di vir de tiştekî ji sedî sed diyar tune ye. Di hevoka "Ez zêde kar dikim." de pîvana "zêde" ne diyar e, belkî li gorî meşa her rojê zêde ye, yan jî li gorî meşa hinekên din zêde ye. Çend mînakên din;

*Ev heval kêm dipeyivî, lê yê din pir dipeyive.*
*Kulîlk heta radeyekê vebûne.*
*Bi qasî hûtekî dixwe.*
*Deh bi deh karan dineqîne.*
*Di demeke kin de digihêje wir.*
*Çar caran bi te xwarinê dixwe.*

### Hokerên pirsiyariyê

Ev hoker jî pirsa hokerên din dikin. Hokerên pirsiyariyê ev in: Çawa, çi, kengî, çi wext, li ku, ji ku, bi ku ve, çiqas, wekî çi û hwd.

Her wekî xuyaye her yek ji wan pirsa cureyekê dike. Bo nimûne hokera "çawa" pirsa hokera çawaniyê dike. Dema em dibêjin, "çûk çawa difire." Bersiva wê hokereke çawaniyê dide dest. Ew jî dikare, hokereke wekî "nizim", "bilind"û hwd. be. Yanê "çûk bilind difire an jî nizim difire."


**Nimûneyên din:**

*Tu ji ku têyî? Ez ji mal têm.*
*Tu bi ku ve diçî? Ez ber bi dibistanê diçim.*
*Elî çi dizane? Ew gelek tiştan dizane.*
*Mala we li ku ye? Mala me li Ruhayê ye.*
*Xwişka ji kîjan hêla bajêr tê? Ji bakur tê.*
*Ew çi wext ji gund derketiye? Ew par ji gund derketiye.*
*Kalikê te kengî hate mal? Îro serê sibê hate mal.*
*Elî mîna kê direve? Ew mîna kêrguh dimeşe.*

---

## Gever û Têkoşer

NEJDET BULDAN



Roj hatiye guhartin. Rewş jî hatiye guhartin. Di bingeha van guhartinan de mirovan xwe guhartiye. Dema mirov xwe biguherin, rewş û roj, helwest û têgihiştin jî tê guhartin. Jiyan tê guhartin. Kurdistan hatiye guhartin. Nirxên wê hatine guhartin. Rabûn û rûniştin hatiye guhartin.

Dema berê ew kesên bi aborî û olî mijûl bibana, qiymeteke mezin a wan hebû.Ew mirovên bi mal û maldarî, dewlemend di jiyanê de qiymeta wan gelek bû. Bila her kesekê zanîba ku rixa wan di aboriya wan de bû. An jî bi gotineke din, şîniyên kevin bûne şahî.

Niha mirovên baş ji bo kurdan, mirovên welatparêz in. Welatparêzî ji bi qahimbûna li ser nirxên neteweyî tê pîvandin.

Berê berjewendiyên şexsê wan çêdibûn. Eger mirov bi destê mirovan hatibana kuştin, kerb û înateke şexsî çêdibû. Mal bi malan, mirov bi mirovan, eşîretan xwîndarî, kîn û kerb dihate meşandin.

Têkoşîna gelê Kurd ew nirx hemû dane guhartin. Berê ji bo tirk, faris û ereban leşkerî dihate kirin. Ew mirin û windabûna ji bo dijmin nedihate çi wateyê.

Niha ji bo Kurdan e. Ji bo Welêt e. Di vê riyê de mirin şehadet e, Birîndarî jî gaziyetî ye.

Her şehadeta ji bo welêt, ji bo azadkirina welat bûye ronahiyek. Li cihê xeribiyê agahdariyên têkoşîna Kurd, bi lez têne destê me.

Agahdarî û bûyerên xweş, an jî nexweş. Her çalakî ji bo me pêşveçûnek e. Her şehadet jî ji bo me şînbûna kulîlkekê li ser axa welêt. Her roj em wan agahdariyan werdigirin.

Çend roj berî niha agahdariyeke hosa min wergirt ku li hêla Culemergê şervanên azadiyê dîsa qurban dane ji bo welatê xwe. Hemû şehîd şehîdên me ne. Lê bi taybetî ew kesên mirov nas bike, şehadeta wan bandoreke mezin li ser mirovê çêdike.

Yek ji wan jî hevalê Têkoşer bû, bi zarokatiya wî, min ew nas dikir. Birayekî wî jî çend salan berê niha tev li refên şehîdan bûbû.. Piştî ku birayê wî Gever şehîd bû,Têkoşer ala wî bilind kir. Bû şervan. Niha têkoşer jî şehîd e. Dayik û babên wan, dayik û bavê du şehîdan in. Bi telefonê ez li dayik û babê wî geriyam. Min dixwest ku ez serxweşiyekê bi wan bidim. Hevalên min bûn, hemwelatiyên min bûn. Ez li dûrahiyê bûm. Li xeribiyê bûm. Ji ber wê çendê dilê min bi şewat bû. Zêdetir ji her windabûnekê, tesîreke mezin li ser min çêdike.

Lê belê bi telefonê wan xemên min verandin. A wan ez teselî dikirim. Gotinên balkêş dikirin. Kêfxweş bûn. Min ji bo teseliyê telefon kiribû, ez hatime teselîkirin.Ez xemdar bûm, ew dilgeş.

Gotina dayîka Têkoşer ev bû: "Kurdistan ez im. Ne ez ne jî Kurdistan bê şehîd azad nabin..."

Babê Têkoşer ji dawiya axaftina xwe hosa digot: "Gever û Têkoşer. Berê ewladên min û dayîka wan bûn. Niha kurên Kurdistanê ne. Ez pê serbilind im."

Belê, dayik û babên şehîdan. Hûn bi şehîdên xwe serbilind, Kurdistan jî bi we serbilind e. Hêvîdar im ku em dê rûmeta wan biparêzin.Gelek mirov xwe bi zindî dixesibînin û hinde kes jî bi şehadetê dibin nemir.


www.arsivakurd.org


## Salvegera 14 tîrmehê:

# Wê demê mirin jî bi îcazetê bû

Helbestvanê navdar Mayakovskî yê ku xwe kuştibû, li ser mirinê wiha gotibû: "Di vê dinyayê de mirin ne tiştekî zehmet e, tiştê herî zehmet xelaskirina canekî/e ye" Lê di Zîndana Amedê de bi qasî ku jiyan zehmet bû, mirin jî bi îcazetê ve girêdayî bû. îcazet nedidan ku mirov li mirinê jî bifikire. Lewre di mirinê de tov û nîşaneyên jiyanê hebûn.

Di dîroka hemû gelan de rojên ku hebûn û nebûna wan diyar dikin, hene. Ji bo gelê Kurdistanê jî 14 Tîrmehê rojeke bi vî rengî ye. Wê serdemê dijmin bi her awayî bi ser wan de diçû. Lê di destê wan de ji bedenawan ya tazî pê de tiştek tunebû. Dîsa jî wan serketinên mezin bi dest xistin. Di rewşeke wisa de pêkanîna serfirazi-









yên mezin ne tiştekî hêsan e û bi cehdê biçûk jî pêk nayê. Lê bi dîrokê diyar bûye ku, li pêşberî sazûmarkariya Xeyrî, bizavkeriya Kemal, biryardariya Akîf û şervaniya Alî ya bi coş, tu hêzan nikarîbû xwe rabigirin. Lewre wan gotina Ho Şî Mîhn ya "Ji serxwebûn û azadiyê bi rûmetir tiştek nîn e" ji xwe re kiribûn dirûşme û bi gotina Serok Apo ku digot: "Tu çeperên ku vîna (îradeya) şoreşgerî jê derbas nebe tune ye" derketibûn rê û ji bo rûxandina dîwaren îxaneta sê hezar salan sond xwaribûn. Şerkirina di riya rûmetê mezin de, îfadeya xwe di vir de dibîne. Çalakiya rojiya mirinê a mezin, ku di 14' Tîrmeha 1982'yan de pêk hat, di vî warî de dibû navê serkeftina ku ne pêkan bû û dihat xuyakirin. Bêşik, têgihiştina van gotinên Xeyrî ne hêsan e: "Ez dest bi rojiya mirinê dikim."

### Di Zîndana Amedê de jiyan ji mirinê hatiye afirandin

Helbestvanê navdar Mayakovskî yê ku xwe kuştibû, li ser mirinê wiha gotibû: "Di vê dinyayê de mirin ne tiştekî zehmet e, tiştê herî zehmet xelaskirina canekî/e ye" Lê di Zîndana Amedê de bi qasî ku jiyan zehmet bû, mirin jî bi îcazetê ve girêdayî bû. îcazet nedidan ku mirov li mirinê jî bifikire. Lewre di mirinê de tov û nîşaneyên jiyanê hebûn. Li aliyê din li derve jî, Partiyê jî haziriya vegera Welêt dikir. Gele me ji bo demekê be jî bêrêber mabû û ber xwe nedîdit. Lewre faşîzma 12 rezberê jî "hukmê bêdengiyê" avakiribû. Di girtîgehê de jî, di şexsê Partiyê de xwestin ku gelê me bixin pêvajoya qirkirinê. Kiryarên ku bi vê armancê dihatine kirin, ji yên Kampa Haydarî û Saygon jî ne kêmtir bûn. Wê demê, faşîzma KT'yê digot, min kelemên li ber xwe tev dan bin piyan, ji ber vê yekê gurbûna berxwedana zîndanê ew har dikir. Dema tevî vê zordariyê teslîmbûn û îxanetkariyê dest pê kir, çalakiyên berxwedêr jî xwe dane der. Kawayê Hemdem Mazlum Doğan, peşiya her kesî li dijî vê rewşê rabû û pêwîstiya dîrokê bi cih anî. Ev bizava dîrokî ya Heval Mazlûm hovîtiya li ser zîndanan nedaye sekinandin. Belê, ev bizav, li pêşberî îxanet û teslîmbûne bûbû çirûskek, bûbû banga li rûmeta partiyê, gel, şoreş û mirovahiyê xwedî derketinê. Yên zû bersiv dane vê bangê çar lawên êgir; Rêheval Ferhat Kurtay, Necmi Öner, Eşref Anyık û Mahmut Zengin bûn. Çirûska azadiyê ya ku heval Mazlûm pêxistibû, di bedenê çaran de bi bû pêtal (meşale), Mixabin tevî vê bexwdanê jî hovîtî, îxanet û teslîmîyet li dar bû.

Xuya bû ku xudayê mirinê hê zêde can û xwîn dixwest, Ahûra-Mazda xeyîdîbû, Mîtra xwe li bêdengiyê danîbû û ferman di destê Ehrîmanê xirab de mabû. Diviyabû gavek wisa bihata avêtin ku erd bihejiya, Mîtra ji xewa xefletê hişyar bike û Ahûra-Mazda bi zarokên ji qewme wî, ji welate êgir Medya re li hev bîne. Vê gave jî bes kesayetiyên wekî Dîokes, sazûmankar û fermandarekî wekî Va Niguyen Giap, kesên xwedî biryardariya Buruno û şervanê wekî Herakles dikaribûn gavên wisa bavejin.

### Dema dîrok hate nivîsandin: 14 tîrmeh 1982

Wan salan, yekî PKK'yî bidin alî, ji yekî welatparêz, yekî şoreşger re ji derfetên jiyanê nemabûn. Di van mercan de pêşengên me yê berxwedanê Heval M. Hayrî Durmuş û Kemal Pir bi dûrbîniya xwe bîr birin ku, heke li pêşberî van kirinan bêdeng bimînin, xelasiya ji îxanetê ne mimkûn e. Êdî gihaştibûn dema ku wê ji mîrovahiyê re biqîrin.

Û va ye dadgehek!

Û vaye dema behnvedanê! Ev ji şansekî ku dîrokê dabû wan, wirdetir fersendek bû. Hevalê Hayri, destê xwe ev çend rojan li ser hev radikir, dîsa rakir. Edî tu bahane ji heyeta dadgehê û hakîm Emrullah Kaya re nemabû ku bibin asteng.

Dûvre got: "Hayri xêr e?"

Jê pirsî: "Tu yê çi bibêjî?"

### Dema jiyan maneya xwe winda dike, ji mirinê re merheba

Heval Xeyrî di nav hevalên xwe re meşiya. Bi çavên xwe mizgîna baweriyê li hevalên xwe kir. Bi meşeke layiqê fermandarên ku mora xwe li dîrokê dixin, meşiya. Gava yekem wî avêt. Ew êdî Spartakûs bû, Emrullah Kaya jî Neronê bi nalet. Û bi îşareta Neron ya "Bikujin" re Spartakûs Xeyrî got: "Heya niha di danişînê (duruşma) de, me tiştê bi me têkirin, vegotin.Yek ji van jî nehat halkirin û vê gavê jî ez bawer nakim ku wê bêne halkirin.Lewre darizandina me polîtîk e. Ji bo ku em li vê derê, li pêşberî we fikra xwe diparêzin, îşkenceyên nedîtî li me tên kirin. Edî tu maneya darizandina me tune ye.Ji bo vê yekê ez dest bi rojiya mirinê dikim."

Piştî ku Heval Hayri biryara xwe da, înternasyonalîstê mezin Kemal Pir û bi dû wî de jî Ali Çiçek û Akif Yilmaz jî bi zanyarî û biryareke mezin tevlêbûna xwe ragihandin.

Heval Xeyrî dema êvarî ji dadgehê vegeriya, coşa dilê wî, wekî çemekî ku di cihê xwe de hilnayê, difûriya. Sebra wî nedihat, bi biryardariyeke xurt li dora xwe dinihêrî û wekî bibêje: "Vaye me dest bi berxwedanê kir." Kef û coşa xwe li hevalên xwe belav kir. Ji kata çaran, bang li kata sisiyan kir:"Em bi ser ketin! Bi şeş hevalan em bi ser ketin." Îşareta destpêka maratonê hatibû dayin.

Ji bo Heval Xeyrî maneya rêberiyê ew bû ku, hêza gel û vîneke kollektîf derxe holê. Heval Xeyrî xwe ji bo pêkanîna rûdanên dîrokî amade kiribû. Ji bo vê yekê, berî ku şehîd bikeve, di wesîyeta xwe de wiha dibêje: "Dema ez mirim li ser kêla tirba min wiha binivîsînin: Ev mirov ji gelê xwe re deyndar e."

Hûn dê çawa bêne jibîrkirin? We, bi berxwedana xwe, Ameda ku demekê di dilê gelê me de bûbû birîneke xedar, kir "qiblegeha mirovahiyê". Di salvegera berxwedana 14 Tîrmehê de, careke din em "bi ser dikevin" û bi deh hezaran "bi ser dikevin". Gotina Heval Xeyrî, ku digot:"Em bi ser ketin", ev bi xwe ye. Niha bi dûv çend salan re wateya vê gotinê baştir tê famkirin.

GIRTÎGEHA BARTINÊ

www.arsivakurdi.org

## BÛYERINE JI DÎROKÊ

❑ 12 tîrmeh 1998 şemî:

**Hunermend û şoreşger Ali Temel şehîd ket**

Di sala 1960'î de li Mêrdînê hate dinê. Di xebata ji bo welat de cihê xwe di nav hêzên şoreşger de girt. Di cûntaya 1980'yî de hate girtin û 10 sal û 4 mehan di Zîndana Amedê de girtî ma û li gel Mazlum, Kemal û Xeyriyan li ber xwe da. Piştî ku di sala 1991'ê de tehliye bû hate Stenbolê û ji bo avakirina NÇM' ê xebat kir. Xebatên xwe di nav Koma Çîya de domand. Di sala 1991'ê de tevlî nav şervanan dibe. Di 12'ê tîrmehê de şehîd dikeve.



❑ 13 tîrmeh 1989

**Ebdirehman Qasimlo hate şehîdkirin**

Sekreterê Gîştî yê Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê Dr. Ebdirehman Qasimlo li paytexta Awistirya Wiyanayê dema ku li restûranteke xwarin dixwar tevî nûnerê PDK-î yê Ewrûpayê Evdillah Qadirî Azad û rojnameger û Parêzvanê Zanîngeha Wiyanayê Fadil Resul ji aliyê ajanên Îranê ve hatin qetilkirin.

*Ü. Gündem kete sala xwe ya 2'yan*

# Çapemeniya Azad ji riya xwe venagere



**Nêzî 300 kesî li avahiya Ü. Gündemê, bi coşeke mezin yeksaliya rojnameyê pîroz kir.**

Roja 7'ê tîrmehê ji bo yekemîn salvegera damezirandina Rojnameya Ülkede Gündemê li avahiya wê kokteylek hate lidarxistin. Ji gelek der û dorên cuda li dora 300 kesî tevlî vê pîrozbahiyê bûn. Di nav van kes û saziyan de, kesên wekî: Nivîskar Mihri Belli, Nivîskar-weşankar Ragıp Zarakolu, Nivîskar Ertuğrul Kürkçü, Tarık Ziya Ekinci, Nûnera Rojnamegerên Sînornenas Nadire Mater, Senarîst Ahmet Soner, Serokê HADEP'a Stenbolê Mahmut Şakar, Gerînendeyê Giştî yê Azadiya Welat Sami Tan, Serokê Înstîtuya Kurdî Hasan Kaya, Serokê DBP'ya Stenbolê Fehim Işık û saziyên wekî: Komeleya Jinên Azad, HADEP, SÎP û Özgür Halk, Sendîkayên karmendan hebûn.

Di pîrozbahiyê de Koordînatora Giştî ya Ülkede Gündemê Yurdusev Özsökmenler axaftinek kir. Özsökmenler di peyivîna xwe de li ser pêvajoya kevneşopiya Rojnamegeriya Kurdî ya ku bi Yeni Ülkeyê dest pê dike û hetanî îro tê, rawestiya. Özsökmenler bi kurtayî dîtin û ramanên xwe wiha anîn zimên: Di vê pêvajoyê de Çapemeniya Azad bi gelek astengî û çewsandinan re rû bi rû ma. Buroyên me hatin bombekirin; rojnameger, nûçegihan û belavkarên me hatin kuştin, di binçav de hatin windakirin, işkence dîtin; rojnameyên me hatin berhevkirin, qedexekirin û desteserkirin. Lê roja ku me da ser vê rê, me dizanibû ku ew tişt li ser riya me hene. Lê baweriya me ya bi çîn û gelên bindest hêz da me. Lewre jî em bê tirs ketin vê rê û di vê yekê de jî gelên me em şermezar dernexistin, xwe ji piştgiriyê neda alî." Özsökmenler di dawiya axaftina xwe de got ku di vê pêvajoyê de ji ber çewsandin û rêlibergirtinan ew temamî negihîştibin mebesta xwe û wan gelê xwe bi têr û tijî ji rastiyan agahdar nekiribe.Wê got: "Em ji ber van kêmasiyan ji gelên xwe lêborînê dixwazin."


Di dema pîrozbahiyê de li der û dor pirbûna polîsan bala mirov dikişand. Ev yek di nava mêvanan û xebatkarên rojnameyê de bû sedema qerfan. Li gorî kesinan "Polîs dîsa birçî bûne, seba ku zikên xwe têr bikin, hatine." Di pîrozbahiyê de ji NÇM'ê Koma Rojhilat bi konsereke biçûk mêvan coşandin. Piştre danîşana slaytê hate pêşkêşkirin. Di danîşanê de dîmenên wekî: Gundên valakirî û şewitî, binpêkirinên mafên mirovan, rojnameger û ronakbîrên kurd ên şehîd û hwd. hatin pêşkêşkirin.

Wekî ku tê zanîn Rojnameya Ülkede Gündemê di 7'ê tîrmeha 1997'an de dest bi weşana xwe kir. Ew jî mîna hemû rojnameyên ji heman kevneşopê li pest û pêkutiyan rast hat. Ketina wê ya li welêt hate qedexekirin, hate berhevkirin. Her wiha cezayê girtinê lê hate birîn û di navbera 9-19'yê gulana 1998'an de deh rojan girtî ma. Niha jî dewlet dixwaze bi sansûrkirinê rê li ber bigire.

AZADIYA WELAT/ STENBOL

## ÇAVDÊRÎ

### Xetera bi tovbûna kurdan



SERKAN BRÛSK

Ev serê demekê ye ku rayederên Tirkan bi awayekî cidî serê xwe bi zêdebûna me kurdan re diêşînin. Dibêjin ger kurd bi vê lezê zêde bibin dê di sala 2020'an de hejmara wan ji ya me zêdetir bibe û dê di warê hejmarê de serdestiya Tirkiyeyê bikeve destê kurdan. Mitala dewletê ev e.

Mitale û paxava dewlata ku li ser mîrasa milûktî û împaratoriyên ku şûr li ser serê heft dûgelan hejandiye û şûrê xwe li stûyê bi dehan neteweyan ko kiriye û ji Asya Navîn ketiyê û di serê wê re derketiye, Balqan û Ewrûpa daye ber xwe, îro, zêdebûna kurdan e. Tovê kurdan raserî çavê xwe kirine û ji xwe re wekî kelemekî esasî dibînin. Stiriyeke wisa bingehîn e ku serê wan diêşîne û xewna rayedarên tirkan direvîne. Heta hinek ji quncik nivîsarên rojnameyan jî kaya vê mijarê dêran, da ku ka û tovê me kurdan ji hev veqetînin û agir berdin bêndera me. Ev ên ku ev ka dêran jî ne pênûsên henek menek bûn. Wekî Ertuğrul Özkök. Vî camerî(!) di gotara xwe de bal kişandibû ser bitovbûna tovê me û xetera vê bitovbûnê. Ewqas serê xwe bi vê meselê êşandiye ku hinek îstatîstik jî peyda kirine. Li gorî van îstatîstîkên ku wî bi dest xistine, hejmara zêdebûna me li gora tevahiya tirkî pir zêde dibe. Ha, ez tiştekî din ji vê gotara vî zir–rewşenbîrî fêr bûm ku hejmara me kurdan zêdetir e. Hey mala derewîna bişewite. Mal keto û şewitiyo, ma li seranserê hemû Kurdistana dibin dagiriya we de ya ku tu wê li gora hêlên Antolî -manatolî bi nav dikî, hejmara we tirkan çiqas e? Yabo em bêjin tevlî polîs, leşker, karmend û malbatên wan bila li derdora milyonekê tirk hebin. Û heta dibe ku hejmara we ji vê jî pir kêmtir be. Ger em bajarên ku tirk lê dijîn bihejmêrin dê tenê çendik bin.

Lê ma tu dê çi jê re bibêjî? Ne Çiller bûya ku digot sê milyon Tirk li başûrê Kurdistanê hene. Em li vir serê tirkan û mala Barzaniyan di zikê hev de bihêlin û li meseleyê vegerin.

Du aliyên vê meseleyê hene; yek jê ev e ku zêdebûna ne li gorî qewata mirovan pirsgirêkan ji wan re çêdike. Barê malbatê pir giran dike. Zarok baş bixwedî nabin û nayên mezinkirin. Dîsa naxwînin û nabin xwedîkar. Jixwe ger li welêt bêkarî û xizantî hebe û dewlet jî alikariya civakî bi malbatan neke ev bar hîn girantir dibe. Malbat di bin vî barî de pir dibetilin. Di rewşeke wiha de metoda herî mirovî û humanîstî ew e ku mirov zanebûna malbatan a li ser zêdebûnê hîn ilmîtir bike. Bihêle ku ew bi her aliyê meseleyê zanibin û li gorî vê zanebûnê, plansaziya malbata xwe bi xwe bikin. Yanî dawiya dawî divê saziyên ku bi vî karî dadikevin biryarê ji malbatan re bihêlin. Lê gelo dewlet vê yekê difikire? Armanca dewletê sivikirina barê malbata wan e? Bi raya min a ku dewleta tirk difikire û armanc dike ne ev e. Mirov dema gotara Ertuğrul Özkök bixwîne mirov dê niyeta wan baş fêm bike. Ew dibêje ku serok di salên 1980'yî de du ferman dane, yek jê hilgirtina çek û ya din jî zêdekirina hejmara kurdan e. Berdewam dibêjê ku kurd di mijara zêdebûnê de bi ser ketine. Ev her du fermanên ku xwedêgiravî serok dane, bi tîpên qalind û xetên beloq nivîsandibû ku bala xwendevanan bikişîne.

Awayê balkişandina Ertuğrul bi wê heyecana Hîtler re pir li hev dike û bi hev re baş digunce. Ev daxwaz daxwazeke faşîst e. Heta tê gotin ku piştî van balkişandinan hinek bijîşkên faşîst vêga li sonda xwe ya ku ji hîpokrat re dane qulipîne.

Belê dijmin bi hemû rê û metodên kirêt û riswa tê ser me. Dixwaze bi hemû awayî doza me ji holê rake. Helblet zêdebûneke asîmîlekirî ne ew zêdebûna ku çavê rayedarên tirkan ditirsîne. Berevajiya wê zêdenebûnek kurdîaxêv û welatparêz malxerakirina dewletê ye.

# Ez Keremê Seyad,

# Vira Radyoya Erî

***Pêşîn hûn dikarin li ser jiyana xwe me agahdar bikin?***

■ Ez Keremê Seyad, di sala 1938'an de li gundê Heko Talînê, li Ermenîstanê ji dayik bûme. Bav û kalê min ji Qersê di sala 1918'an de hatine wî gundî. Em du bira û sê xwişk in.

Min di zarokatiya xwe de ji karê rojnamevaniyê hez kir û bi ser wê de jî ji xebata radyoyê. Dema zarok bûm, min ji radyoya ermenî hez kir. Paşê min di rojnameya Diroşosp (Ala Komûnîzmê) de dest bi kar kir. Rojnamevanê wê rojnameyê jî gelekî bi qedrê min zanibûn. Pêşnivîsara rojnameyê yanî rûyekî rojnameyê pêşkêşî min kiribûn. Piştî ku posta rojnameyê ya rojane hat, êdî xwediyê nameya pêşî Keremê Seyad bû. Paşê ku rojnameya "Riya Teze" derket, min qeweta xwe li ser nivîsara kurdî xerc kir. Hetanî sala 1960'î min ji bo radyoyê nivîsand. Hetanî wê salê înformasyonên min hatine dayinê. Di sala 1960'î de ji bo ku ez di Radyoya Erîwanê de kar bikim, gazî min kirin. Wê çaxê redaktorê para kurdî (serwîsa kurdî) Xelîl Muradof bû. Wî, ez teklîf kirim. Wê çaxê bavê min gelekî li ber min ket. Gotê min: "Tu yê tenê herî Yerîwanê bê yêr bê mal, tê çawa herî û werî." Lê min lê da ez çûm. Wê çaxê radyoyê got, wekî rojnamevan bixebite. Lê wê demê bona radyoyê spîkerek lazim bû. Ji ber vê yekê elemetek dan. Hingî 26 mirov hatin. Wê çaxê ji 26 mirovan dengê min begen kirin (ecbandin). Di sala 1960'î de min dest bi kar kir.

***Beriya salên 1960'î radyoya Erîwanê çend deqîqeyan weşana xwe dikir?***

■ Di salên 1955'an de xeberdanên me di hefteyê de sê cara dihate dayinê. Ew jî 15 deqîqe bû. Ew jî tenê bona binêriya Respoplîga(komar) Ermenîstanê bû.

***Baş e, piştî salên 60'î jî radyo bi tenê ji bo Respoplîga Ermenîstanê bû an na? Digel wê saeta weşana radyoyê zêde bû?***

■ Na, êdî gelek kurdan li radyoyê guhdarî dikir. Di sala 1961'î de her roj xeberdanên me rojê saet û nîvekê hatine dayîn. Bona saetek û nîvekê hingî 12 xebatkarê me hebûn. Xeberdana me piştî ku li çar parçeyê Kurdistanê baş hate bihîstin, êdî radyoguhdaran ji me hêvî dikir ku, em li ser navê wan kilama bidin. Bona me name dişandin.

***Wê demê bêhtir ji kîjan heremê name diketin destê we?***

■ Wê demê ji Kurdistana Başûr daha gelek name diketin destê me. Lê li Kurdistana Bakur jî me daha paşê bihîst ku li xeberdanên me guhdarî dikin. Lê tirs xof li ser wan hebû. Wekî carna ji Kurdistana Bakur li Ermenîştanê biqesidiyana yanî li bajarê Sovyetê biqesidiyana rastî me dihatin me ji wan dibihîst. Radyo guhdarên me yên li Kurdistana Bakur nikaribûn azad li xeberên me guhdarî bikin.

***Hingî bêhtir di radyoyê de xeberdan hebû yan muzîk?***

■ Wê demê daha zêde me li muzîka dida. Xeberdanên me jî hebûn. Lê wextê ku Sovyet, ev îtîfaqa şewrê belav bû, ji hev berda çetinahiyên mezin bona Ermenîstanê pêşta dihatin. Ermenîstan di rûyê dewleta cînar Azerbeyacanê de kete nava hesarê. Ekonomîka wê êdî ji hev berda. Ji ber vê yekê xeberdanân me û yên welatên din jî hatine kurt kirinê. Bû 45 deqîqe. Ew çar salên çetin ketin nav serpêhatiyên min.

***Hûn dikarin serpêhatiyeke xwe ji wan rojên çetin vebêjin?***

■ Dikarim bibêjim. Ewil ronkayî tunebû. Rojê saetekê, rojin hebûn qet ronahî tunebû. Xebat, febrîke, zebit êdî sekinîn. Meaşa cimatê ya xebatçiya kêm bû. Belavkirina xeberdanan zêde bû lê wexta qewata Ermenîstanê negihiştiyê kêm bû. Transporta (erebe) respoplîgayê nedixebitîn. Beriya zivistanê riya yekling ê şerqa berfê me diqelaşt. Di tarîstanê de tam 5 kîlometre peya diçûme malê û pênc kîlometre dihatim. Nava pêçiyê ling ê min, di wê çaxê de sirê birîne. Carna wisa diqewimî cihê xebatê sar sip sar, min destê xwe wiha dida ber cênîka xwe. Bi şev saet di 2'yan de min dinêrt di tarîstanê de nikarim biçim mal li cihê xebatê radizam Ez gelek caran li cihê xebatê mame. Bi nîgê şil min destê xwe daye ber cênîka xwe û rûniştî hinijîme, şeveqê jî çûme malê. Rojekê kufleta min zarokên min jî pê hisiyane ku ez nehatime malê ji ber ku telefon xera bûbûn, haya me ji hev nîn bû. Şeveqê hatine radyoyê ka elo çi bûye, piştre hatin dîtin ku ez li radyoyê hinijîme. Paşê mesela 15 deqîqeyan xeberdanên radyoyê dihatin birînê. Îşiq diçû û dihat.

***Kî û kî ji radyoyê veqetiyane? Hûn dikarin çend navan bibêjin?***

■ Wezîrê Eşo çû Belgiyayê (Belçika), Ahmedê Gogê van salên dawîn çû hêsabe. Ji ber nexweşîna xwe dev ji her tiştî berda, êdî naxebite. Cemalê Usif çû Rûsyayê, Tosinê Reşîd mesela hat 2-3 salan xebitî piştre çû Avustralyayê. Gulîzera Asim çû Afriyayê. Pey Xelîl Mûradof Ahmedê Gogê bû berpirsiyar. Ahmedê Gogê hingî got bila lawê te Tîtal bê. Wê çaxê lawê min Tîtal Înstîtut dixwend. Wî dihat carina spîkerî dikir. Piştre di radyoyê de Tîtalê bû berpirsiyar. Ez dixwazin tiştekî bi ken bibêjim. Tîtal xebatçiyê salê bû, nû dest bi kar kiribû, ez jî xebatçiyê 30-40 salî bûm. Dihat ji min dawe dikir: "Ka te îro çi kiriye, tu çira naçî wê derê!" Kuro lawo ez jî dibêjim, here ji yên ku kêm xebatê dikin re bibêje. Serokê Ermeniya ji me re digotin, aha dîsa bav û kur bi hev ketin. Paşê Tîtal çû, êdî ez bûme berpirsiyar, îcar ez li ser xeber didim. Me kêmasiyên hev ji hev re digotin. Dema em li ser kar bûn, ez, Leyla û Tîtal em wekî heval xebatkar bûn. Lê li malê dîsa ez bav, ew zarokên min bûn.

***Radyoya Erîwanê ji aliyê muîkê ve bi kê dest pêkir û niha jî vê kevneşopiyê bi kê an jî bi çi awayî dişopîne? Wekî mînak berî vêga we qala Şamilê Beko kir...***

■ Şamilê Beko, aşiqekî bi nav û deng û hosteyê sazbendiyê ye. Ew stranan nabêje, li mey, zirne û fîqê dixe û xebata teşkîldariyê ya koma wî heye. Ew di salên 1930'î de li temamê Sowyetê geriya, niha jî gelek kilam û muzîkên wî wekî şiîr tên guhdarîkirin. Wî li Moskovayê gelek konser ji dane.

***Piştî Şamilê Beko kî hat?***

■ Egîdê Cimo hat. Ew paşî bû xebatkarê me. Mûzîka Egîdê Cimo gelekî nazik e. Ew di zanîngehê de di beşa mûzîkê de bû. Egîdê Cimo hetanî dawiya salên 1980'yî xebitî. Emegê wî di nav arşîva me ya sazbendiyê de gelek gelek heye.

***Me Kawîs Axa û gelekên din bi saya radyoya Erîwanê nas kirin. Ji bilî van çi denbêjên kurd yên navdar hene?***

■ Di wan salên ku Xelîl Mûradof berpirsiyar bû, bi qeweta wî gelek tişt hatin nivîsandin. Dengbêjên ku di pêş de dihatin yên wekî Şeroyê Biro, Efoyê Esed, Mahmûdê Mûsa, Mecîdê Silêman, Zadîna Şekir, Memoyê Silo

***We ew jî bi riya nameyan dianîn?***


■ Na, me yek bi yek ji malên wan bang li wan kiriye. Bi mesrefa radyoyê em çûne ba wan û me ew anîne. Ew îro bûne hebûna dewleta Ermenîstanê.

***Xebata we ya di rojnameya Riya Teze bi çi awayî bû?***

■ Redaktorê rojnameya Riya Teze Mîroyê Yesed gazî min kir. Got, "Divê tu ji bilî xebata radyoyê, ji bona rojnameyê bixebitî." Ez du sal û nîvan di rojnameyê de xebitîm. Şeveqê diçûm rojnameyê, êvarî jî li radyoyê dixebitîm. Min navberî nedaye xebata radyoyê. Piştî sê salan dîsa gazî min kir, hingî jî berpirsiyar Titalê Efo bû.

***Radyoya Erîwan bo Kurdistanê radyoyeke dîrokî ye. Me bi saya Radyoyê gelek hunermend nas kirin. Ev 44 sal in ku radyo li ser kar e. Ji hingî û heta niha ji radyoya Erîwanê çi hate xwestin?***

Min pêş de piçek got, mesela cimeatê hindik be rindik be, 45 deqe wadê me heye. Me xwest wan 45 deqîqeyan xeberdanên xweş bên bihîstinê. Xeberdanê xweş ne tenê bi gotin an jî bi kirina me, bi xwestina guhdaran. Xwestina guhdaran ew e îro, erf û adetên milet bê xweyî derneyê, sazbendiya miletiyê bêxweyî derneyê, mûzîka miletî bê xweyî derneyê, milet nehele, milek winda nebe û çi qewmadinên dîroke kurdan de hebin li her çar parçeyan wekî em borcdar bin, malûmetiya solixdar




**Piştî hilweşîna Sowyetê erebeyên nedixebitîn. Di tarîstanê de tam 5 kîlometre peya diçûme malê. Nava pêçiyê nigê min, wî çaxî de sirê birîne. Carna min dinêrt di tarîstanê de nikarim biçim malê, ez li cihê xebatê radizam.**

www.arsivakurdi.org

# vanê...

**Ji Kurdistana Başûr gelek name diketin destê me. Lê li Kurdistana Bakur jî me paşê bihîst ku li xeberdanên me guhdarî dikin. Lê tirs xof li ser wan hebû. Guhdarên me yên li Kurdistana Bakur nikaribûn azad li xeberên me guhdarî bikin.**



zin e. Di cimaeta me de hinek mirov hene xeberekê bi zimanê xwe, du xeberan bi zimanê başqe dibêjin. Hinek hene bi sê zimanê başqe dikine nav kurdiya xwe. Ûrisî, gurcikî, kurdî. Cemaeta me ya Gurcistanî wisa dike. Ya Ermenîstanê jî, kurdî û ermenî li nav hev du dixin. Ez di zahrê kesên ku xalis temiz zimanê dê neaxive de dibêjim. Di nav wê xebardanê de ez dibêjim divê dê û bav navê miletiyê li zarokên xwe bikin. Dîsa ez dibêjim dema bidin. Ka li ku li çi qewimiye? Ber wê yekê min bernameyeke wiha teşkîl kir.

***Mesela wekî mînak hûn dikarin der barê bernameyên xwe de me agahdar bikin?***

■ Roja duşemê: Dengûbasan didim. Pêşî der heqê hal û wextê Ermenîstanê de, paşê halê dinyayê, paşê jî qewmandinên ferz di nava emrê gelê kurd de. Piştre jî kilamekê li gorî dengûbasan didim. Dû wê de jî şîrovekirinekê an jî roportajek hebe, ez wê didim. Ji bilî wan em her roja duşemê programekê bi navê derheqa hal û wexta Kurdistanê de didin. Guhdar dizane duşemê ev proram wê bê dayînê.

Roja sêşemê: Dengûbas, şîrovekirin, roportajên mayîn. Roja sêşemê xeberdanekê didim ji cêrga zimanê te yê ji dê. Tu bi çiqas zimanan zanibî, dema tu zimanê dê nizanibî kêmasiyeke lepê mehûn wekî reqesa miletê xwe nelîstin, we wekî muzîka miletê lênexist, dev ji kilama xwe berdin pey kilameke başqe de biçin, bêkêr e. Ez dibêjim dema navê miletiyê nîn be, muzîka xwe ya miletî nizanibe, erf û adetên govanda kurmancî yanî ew li xwekirin û wergirtina miletiyê wî tune be, ew zaro sibê mezin bû wê ji miletê xwe dûr be. Mih wekî berxa xwe neban (xwedî nebû) bû berxa wê, wê beşqe here. Dema em îro li zimanê xwe, muzîka xwe reqsa xwe nebine xweyî, emê bihêlin herin.

Roja çarşemê: Roja cergê serhildanên kurdan e.

Roja pêncşemê: Ez afirandinên şaîr û nivîskarên başqe başqe pêşkeş dikim.

Roja Înê: Xeberdanekê dikim, wekî cêrga li xerîbê xwe digerin. Di sala 1915-16'an de cimeata me belav bû. Ji ber zilma siyaseta dewletên başqe başqe. Destê bav, kur, yad, met, kurmet, qîzxaltî, pismam, li welatên xerîb bi cih bûn. Ez jî elemetiyê didim: "mirovê we kî ye û kîjan salê winda bûye, ji kerema xwe re ji me re binivîsin, bi serê wê elemetiyê em ê teşkîl bikin, ji bo ku hûn wî nasê xwe bibînin."

***Heta niha tu kes bi saya we gihîştin hev?***

■ Bi saya me gelek kes gihîştin hev. Hin mirov hebûn li Tirkiyeyê mirovên xwe dîtine. Yên Tirkiyeyê jî li Ermenîstanê dîtine. Hin mirov hene di Ermenîstanê de yek li Erîwanê yek jî li nahiya Ermenîstanê lê 40-50 salî hev nedîtine. Bi saya xeberdana me hev dîtine. Min bi xwe jî bi saya xeberdana xwe xalê xwe dît. Min wisa element da: "Wekî Mîroyê Zirde behsa bavê xwe dike. Navê bavê wî Zirbe, Zirbeyê Bêmal, bê Malê Evdî, navê bireyê Zirbe Hemo, navê kufleta wî Meyo, navê kurê wî Mîro Sûdîk di sala 1930'î de winda bûye, ez bahsa wî dikim."

Roja şemiyê: Xeberdanên Teatrayê didim.

Roja yekşemê: Kilamên ku radyoguhdar dixwazin raber dikim. Telefon dikin.

***Piştî ku şerê tevgera azadiyê li bakurê Kurdistanê dest pê kir çi tesîr li Radyoya Erîwanê kir?***

■ Radyoya Erîwanê radyoya gelê kurd e. Gelê kurd îro di axiriya dewleta serbest de ye. Di temamiya Kurdistanê gelê kurd, li ku derê be li Suriyeyê be, li Îranê be, li başûr û bakurê Kurdistanê be heweskar e. Ez dixwazim bi tenê vê bêjim, ez ji temamiya gelê kurd re, temamiya serokan re, partiyê kurda re temamê cimeta kurd re tenê xîretê serkeftinê yekîtî û îtîfaqê dixwazim.

***Heta niha çend kasetên hunermendên kurd di arşîva Radyoya Erîwanî de hatine civandin?***

■ Kasetê dengbêjan gelek in. Reqema wan nikarim bibêjim, zaf in. Kaset jî ji 2500'î zêdetir in. Di nava wan de yên salên 50'î û heta niha başqe başqe ne. Ji ber halê aborî di wan salan de me çi nivîsan dibin ew in.

***Guhdarên Radyoya Erîwanê stranên nûjen dixwazin?***

■ Zêde na. Mihemed Arifê Cizrawî dixwazin. Ji hemû parçeyên Kurdistanê stranên kevin yanî yên mêraniyê, mêrxasiyê dixwazin.

***Pir kesan li ser radyoyê tiştên xweş gotine. Gelo kesî piştgiriya we kiriye?***

■ Wekî ewil bêjim, gişka pesnê me daye. Li kîjanî rast hatim gotiye eva xweş e lê di warê alîkariyê de tiştek negihiştiye me. Gotin heq e, mirovin hene bi zimanê xwe welatparêz in dibêjin, lê ji kirina xwe ve nîşan nadin. mirovin hene li serê disekinin dibêjin divê em wiha bikin lê ew tenê dixwazin. Ev pêçiya min rojê 30-40 perî destnivîsa dinivîse. Şerm e dibêjim lê ez ji were sond dixwim, qewimiye min 8 meha maeşê xwe nivîsandiye daye xebatçiya ji bo werin bixebitin. Rast e perê riya wê tune ne. Temamê radyoyê di vî halî de ne. Ne em tenê. Lê dengê guhdarên me germ tê. Ez wisa dixwazim, ezê wiha bikim. Lê me tiştek alîkarî malîkarî nedîtiye. Îro li cihê xebata min televîzyona min tune be, antêneke min ya MED-TV'yê tune be û hema ez wisa rûnem wexta xwe wilo vala derbas bikim, tu qîmetê wê tune ye. Wexta ez nizanibim di Kurdistanê de çi qewimiye. Çira ye?!

***Dema alîkarî bê kirin wê di radyoyê de çi guherîn pêk bên?***

■ Xeberdana me wê daha bê xweşkirin. Xebera ku ezê di deh rojan de bibihêm, ji dêvla ku di destê mirovê başqe başqe de bigirim, ezê di rojê de bêjim, îro wekî wê rahmetiya Sema Yüce şehîd bû, bêjim û xeberdaneke şînê û mêrxasiyê çêkim, hildim bidim. Ne ku ezê vê xeberê piştî deh rojan ji bo guhdaran bêjim. Mesela gelek guhdar hene MED-TV'ya wan nîn e. Li Tirkiyeyê jî belkî ya hemûcikan nîn be.

Problemên me zaf in. Çawa ez roja îro zaroyê xwe xweyî bikim heta 38 salî paşê bêjmê tu here ne zaroya min î, ne kurê min î, here ji min dûrbikeve. Îro dilê min li ser radyoyê bi vî cureyî ye. Ez anika hatim vira hê jî sewdayamin li Erîwanê ye. Êvarî ez ê telefon bikim, ezê bêjim ka çawa ye, çi dibe, çi nabe. Mesela min telefon kir, got li ser vê keçikê xeberdaneke şînî hazir bike û bide, dema ez hatim ez ê xeberdaneke xweş û şînî hazir bikim.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN

www.arsivakurdi.org

# Helbestên li ser gerdena Welêt

## Çîroka ku te nivîsand

*Şev e*
*Te agir dadaye*
*Agir ku çend hezar mal şewitandin*
*Agir ku di hembêz te de*
*bûye roj*
*Pevyên te ref bi ref*
*Newrozî Newrozî ne*

*Dilê te, evîna te*
*Berhemên te dastan dastan*
*Li ser gerdana Welêt*
*tête rêzkirin*

*Çîroka ku te nivîsand*
*Oratoryo oratoryo oratoryo ye*

*Agir li pişta te*
*Tu li pişta Agirî*
*Bextê Agirî xêz bi xêz*
*Oratoryo oratoryo oratoryo ye*

*Min xwest ev helbest*
*tîpek di peyvên te de be*
*û helbesteke bêdawî be*
*Peyvên te ku ref bi ref*
*Newrozî Newrozî Newrozî ne...*

Cîhan Roj

## Kam eşkeno hêvî hefs kero

*Ez zana*
*Keweyî çimanê to de biya vila*
*Ez zana ha..*
*Pey caxanê asînan ê zengarinan de*

*Yew hêvî netelnayiya*
*Yew xeyal....!*
*Û yew qirîna bi jiyan wa bestî*

*Vanê qey; Merdiya gama tarî nişeno ro*
*Bi bêvengiyê ka gewre xapêyenê misêwa*
*Û Homayanê xo ra musayê zilim bikerê*
*Caw ko ti tedewa*

*Miyanê çar dêsanê ku tera boya hî yena*
*Wa çirey nêtewêyo mertalê xoverdayinî*
*Ku li awirinê to barkerdewo*
*Ku awirên to zî nika hay madir*

*Û ma di pêro xeyalanê to de estê!...*
*Ma yew bi yew zêdiyenê*
*Ma benê kila adirî*
*Di bedenanê tavistan de*

*Wa nêvacê qey;*
*Her çî peynî beranê serdinan de hefs beno*
*Wa nêvacê qey;*
*Herûndê rêçanê elektrodî vinî beno*

*Di bendenanê ma de îşkencan ra pey*
*Hadê, awirêka nerm biperne çimanê xo ra*
*Wesar te de bieşrawe koyan rê*
*Wa vilêka narîne abo*
*Wa qe, boya guna germine te ra biyo*
*Hadê, vengêko nerm biresne ma*
*Peynî dêsanê serdinan ra*
*Wa biyê pêser pêro hawarî*

*Û yew bi yew li hewa bar bibê*
*Wa bi şermayê ê ku bi zilmê xo benê Homa*
*Hadê meheredne kewetiya çimanê xo*
*Banêre, her çî çiqas nezdî yo*

*Hadê destê xo pawane*
*Peynî asinanê çeprastan û zengarinan ra*

Fehim Kaya
Ji tirkî werger: Roşan Lezgîn



## Hêviya Barana Havînê

*Xemgîniya dilê we*
*kengî difûre?*
*Bi barana havînê re*
*Mîna şîrê di sîtilê de*

*Hûn kengî hêvîdar dibin*
*Ji xeynî şînkahî û biharan?*

*Ez bi barana havînê hêvîdar im*
*Her dilopek*
*Şînkahiya biharê*
*Zarokek sikaka-bêtûrik*
*Gundekî şewitî*
*û*
*Egîdekî şilf û tazî*
*ji mezel derxistî*
*ji min re tîne*

Şêxmûs Sefer

## Mixabin

*Çar kanî ji min diherikin*
*A yekemîn axîn e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Gazinc e, hêstir e, xwîn e*
*Dayika min Kurdistan*
*Mixabin her dan*
*Li hember qulbeyê xwe, wa diana dixwîne*

*Çar kiras li min kirine*
*Ê yekemîn tariyê*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Sixurî ye, paşverûtî ye, hevkarî ye*
*Mebesta me şewitandina wê giraniyê ye*
*Lê mixabin agir hîn ji me re dêmarî ye*

*Çar sing kutane dilê min*
*Ê yekemîn li xofa saf e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Ji hesin e, ji pola ye, ji agirê dev bi kef e*
*Kurtiya wê tajana şermî*
*Mixabin bi sarî û germî*
*Ji dîlana me ya dîrokî re zirne û def e*

*Çar tavan ji min re pîvane*
*A yekemîn ji êş û jana min re, şivan e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Bêdengî ye, nerastî ye, bindestî ye*
*Mixabin ev jî hezar sal e li welatê me mêvan e*

*Çar didan ji min re hiştine*
*Ê yekemîn lingkolane*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Ezperestî ye, kevneperestî ye û panê kal û kalan e*
*Heke em binê van didanan bikolin*
*Mixabin em ê binêrin ku her yek bihuştek talan e*

*Çar çira li mêjiyê min vêxistine*
*A yekemîn derew e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Durûtî ye, xayintî ye, rev e*
*Mixabin zêr e, zîv e, dirav e*

*Çar dojeh ji min re ava kirine*
*A yekemîn Rojhilat e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Bakur e, Başûr e, Rojava ye*
*Şewata van çil qat e*
*Bi eslê xwe jî çi mixabin warê Kawa ye*

*Çar gor ji min re veşartine*
*A yekemîn nezantî ye*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Birçîtî ye, tîtî ye, xizantî ye*
*An pirzantî ye an erzantî ye*

*Çar nav li min kirine*
*Ê yekemîn qewmê Nemrûd e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Tirkên Çiyayî ye, gelê hovî ye, neteweya şerûd e*
*Navbereke serbixwe tune mixabin*
*Heke heye, bila derkeve holê, bersiva van naweyan bide*

*Çar ekl dotinê devê min*
*A yekemîn tûjtî ye*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Tisîtî ye, işktî ye, rijitî ye*
*Mixabin kes nikare bîne zimên û bibêje:*
*Hezar sal e ev çi qebqeb û qîjqîjîtî ye*

*Çar rê danîn ber min*
*A yekemîn mirin e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Koçberî ye, penaberî ye, qirkirin e*
*Ez bizanibim gavavêtin aştî ye*
*Ez ê bi kortî bimeşim, bimirim!*
*Lê mixabin mebesta van a fermî, derkirine*

*Çar derman ji min re hiştine*
*Ê yekemîn "xwîn bi xwînê" şûştine*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Hêrandine, bişaftine, guvaştine*
*Em çiqas biratiyê pêşkeş bikin têr nabin*
*Têrtiya van mixabin, bi hêvîtî kuştine*

*Çar êş şidandine di dilê min de*
*A yekemîn evîna birîndar e*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Evîna rûreş e, xeyala cankêş e*
*Benê bi kîn e*
*A yekem, mîna havîna sar e*
*Yê din jî her yek*
*Mixabin dansaleke arê har e*

*Çar sond xwarine ji bo min*
*A yekemîn xwîndotine*
*Yên din jî bi dorvegerî*
*Xwînmijîn e, xwînrijîn e, xwînfirotin e*
*Tola van ya dawîn jî mixabin hestîkotin e*

Îlhamî Özer

www.arsivakurdi.org

## ÇALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● **11 tîrmeh 1998 şemî:** Konsera Koma Çiya, saet:15:00

● **12 tîrmeh 1998 yekşem:**

NÇM destana berxwedanên girtîgehan radigihîne.

Amedekar: Teatra Jîyana Nû, saet: 14:30

Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:18:00

● **17 tîrmeh1998 în**

Fîlm: "Endîşe"

Derhêner: Şerif Gören, saet: 18:00

Li NÇM'ya Îzmîrê

● **11 tîrmeh 1998 şemî:** Kermes: "Piştgiriya Yekîtiya Malbatên NÇM'ê", saet:15:00

● **12 tîrmeh 1998 yekşem:** Şano "Ada" (Girav)

Amedekar: "Karaman Şehir Tiyatrosu"

Athol Fugat, saet:17:00

● **14 tîrmeh 1998 Sêşem:** Encama Pêşbaziya helbestan a TAYD-DER' ê, saet:18:00

● **17 tîrmeh 1998 în:** Konsera Koma Gulên Xerzan, saet:18:00


*Pêşangeha Aşkın Ayrancıoğlu vebû*

# Karîkatûrên li dijî kapîtalîzmê



Aşkın Ayrancıoğlu

**Ayrancıoğlu ji sala 1991'ê heta îro pêşengiya organîzasyona pêşangehên karîkatûran a bi navê "Ondörtlü" (Çardexwur) dike. Ev organîzasyon ji aliyê wî ve wekî "Organîzasyona li dijî kapîtalîzmê û bazara mîzaha wê ya ku ji nû ve diafirîne" tê binavkirin.**



Wênesaz û karîkatûrîst Aşkın Ayrancıoğlu pêşengeha xwe ya dawîn li Navenda Çanda Mezopotamyaya Stenbolê roja 2'ê tîrmehê vekir. Karîkatûrîst Ayrancıoğlu bi eslê xwe ji Boyabat'a Sinopê ye. Di sala 1991'ê de "Beşa Wêneyan a Zanîngeha 19 Mayısa Samsunê" kuta kiriye. Aşkın Ayrancıoğlu ji bilî karê wênesazî û karîkatûrê; bi wênekêşiyê re jî mijûl dibe. Yekem car, di sala 1987'an de bi "Pêşbaziya Karîkatûran a Abdi İpekçi" dest bi hunera karîkatûrê kir. Ew heta niha beşdarî gelek pêşbazî û çalakiyên karîkatûran bûye û gelek xelat wergirtine. Herwiha di sala 1995'an de, di xelatdayîna pêşbaziya "Apê Musa û Şehîdên Çapemeniyê" ku ji aliyê Rojnameya Yeni Politikayê ve hatibû organîzekirin de, di beşa karîkatûran de xelata yekemîn digire. Ew ji bo pirsa me ya bi rengê "Feyza xêz û xetên we çi diyar dike" de dibêje ku bingeha tevahiya berhemên sosyalîst ji rewşa gelên bindest xwe dide der. Di karîkatûrên Ayrancıoğlu de bi piranî îhlalên mafên mirovan, mejiyê (zihniyet) leşkerî û hwd. balê dikişînin ser xwe. Ew sedema vê yekê wiha tîne zimên: "Ev giş rastî ne. Heger ev yek tûnebûna me jî ew xêz nedikir. Îro gelên me ketine bin êşên gelek giran. Li welatekî ku xwîn ji avê erzantir be û her roj lêdan û îşkence bê dîtin, gelo tu bî tê çi xêz bikî?"

Li gorî dîtina karîkatûrîst hûner, amûreke têkoşînê ye û pêwîst e ku huner di nav civakên bindest de çekeke karîger be li dijî bûrjûwaziyê. Her wiha li gorî baweriya wî mîzah li Tirkiyeyê di rewşeke karesatî de ye û tevahiya kovarên mîzahî her çiqas qala gel, demokrasî û azadiyê dikin jî, di nav xwe de şêwazeke kedxwarî bi kar tînin û heman kovar bi riya pornhografiyê xwê didin firotan.

Aşkın Ayrancıoğlu heta niha di beşa wêneyan de şeş, di beşa karîkatûrê de sê û di beşa fotografan de jî du pêşangehên şexsî li dar xistiye. Wênesaz, yekemîn pêşangeha xwe ya şexsî, di sala 1990'î de bi armanca protestokirina hunermendên ku ji bajar û metrepolên mezin dernakevin û naçin nav gel û xwe ji wan dûr dixin, li gundê xwe Bağlıcayê vekir. Pêşengeha wî ya yekem bi destê zarokeke gundî hate vekirin.

Aşkın Ayrancıoğlu hê jî kar û barên xwe di "Mum Kültür Sanat Dergisi" (Kovara Çand û Hunerê Mum) yê bi navê "Çizgisel" û di Kovara "Uzun Yürüyüşê" de jî bi navê "Çizdüşüm" wekî karîkatûrîst didomîne. Ayrancıoğlu di warê teknîkî de xebatên xwe zêdetir wekî wêneyî bi nav dike. Karîkatûra wî ya yekem di sala 1989'an de di Rojnameya Petrol-İş'ê de hate weşandin. Ayrancıoğlu heta niha li gelek welatên cur be cur beşdarî pêşangehan bûye. Ew ji sala 1991'ê heta îro pêşengiya organîzasyona pêşangehên karîkatûran a bi navê "Ondörtlü" (Çardexwur) dike. Ev organîzasyon ji aliyê wî ve wekî "Organîzasyona li dijî kapîtalîzmê û bazara mîzaha wê ya ku ji nû ve diafirîne" tê binavkirin. Pêşangeha Aşkın Ayrancıoğlu, wê heya 22'yê tîrmehê li salona NÇM'ê vekirî be.

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

## TÎŞK

# Famkerdena dîroke de rolê nivisnayena edebiye



LERZAN JANDÎL

Bêguman çiyêke dîroke de biyê yan jî benê, zaf kesî zanê. Eke nê biyenê, biyene ke sarê mordeman ra, şaran ra derbaz biyê teyna zanayene nêvecena. Ganî mordem nê biyenan ebi hîs, ebi zerê, ebi mezg zerê xo de bihelêno. Merdem şîrîgê nê biyenan nêbî, şîrîgê derd û kulanê nê kesan, şaran nêbî, na zanayenen zaf zuya manena.

Zanayena niya zuyaye jî ebi qeder a. Sebeta ke mordem bê zanayene nêşîkîno dîroke fam bikero, cira dersan veco, ganî mordem zuyabo jî bizano.

La belê zanayena tewr rinde, zanayena ke mordem ebi heş, ebi hîs, ebi mezg, ebi zere zano, ya. Na her çîra ver seba sarewedardayena şaran, kîştena şenikiyan, lecanê demdaran zaf muhîm a.

Dîroka şarê ma de zaf rayan sarewedardayenî, kîştenî, vêşnayenî, rijnayenî, koçberkerdenî, qehremanî biyê û estê.

Eke ma tenê pêyser şîme, ma vînenîme ke şarê ma derheqê nê biyenan de fikr û hîsê xo ardo re zon. La belê na ere zon ardene objektîv niya, zaf rayan subjektîv a.

Ma vacîma derheqê yew lecî de, derheqê yew sarewedardayene de, derheqê yew kîştene de yew kilam ama vatene (ke no metod, xo ere zon ardena şarê ma ya klasîk a). La belê na lawike de çiyî, biyenî ne ebi raştiye, ebi realîte, ebi hîs û waştenanê dengbêjî ame re zon. Zaf rayan heto yew zaf qehreman, heto bîn jî zaf xayîn o. Zaf rayan dişmen rind niyano şinasnayene. Dişmenî ra merhamet amo waştene, ere dişmenî bawar biyo, dişmen zê yew pêrotiye niyamo diyene, dişmen zê kesanê xirabina, kesanê bêbexta amo şinaskerdene.

Metodo bîn jî vatenê fekî yê. Nê jî zê kilaman ê. Bê guman mordem nêşîkîno nînan peyser red bikero, la belê nê teyna xo ser jî kêmî yê, şaş ê.

Ganî dîrokê hênî bêro nivisnayene ke, mordemo ke waneno, hênî binê tesîrê daye de bimano û nayê xo vîra mekero. Ê janî, ê dejî, ê zulm û a zordariye tonê astanê xo de hîs bikero. Hîs bikero, ke xo vîra mekero, cira derse bigêro, bimusno domananê xo.

Na jî teyna ebi nivisnayenedê, ebi fomêde edebî de mumkun a. Yanê zê yew romanî, zê şanike, zê şiîre. Hênî bo, ke wendox xo wunciya zerê dîroke de, ê rojan de bivîno.

Na derheq de di hîrê çiyî amê nivisnayene. Ma vacîme romanê Munzur Çemî "Gülümse Ey Dersim" yan jî pirtûkê Muzaaffer Oruçoğlu "Dersim" na derheq de nimûneyê rindekî yê. Mordem ke nê romanan waneno, ebi raştiye mordem xo zere ê biyenan de vîneno. Qey ti vana, ewro wunciya a roja, ê janî, eşî, dejî to jî ancena.

La belê na derheq de kemasiyê ma huna zaf estê. Ebi naye nêwazena, ke kesî gunakar bikerê. Çimkê mordem nêşîkîno yew kesî ra yew roman, yew şiîre, yew şanike biwazo. Naye re dem lazim o. Çiyo ke ma ganî xo vîra mekerîme, o wo, ke îhtiyaciya şarê ma ebi naye esta.

# Şerê Hemê Sewilkê û Mecîdo

*Go Mecîdo ba kir:*
*Go Hemê, Hemê Sewilkê,*
*Go ez heneka li te dikim,*
*Ti bi jidil şerê mi dikî,*
*Go ezê kim ku ti,*
*Sênca Haciyê Simayîl,*
*Bi serê xwe qul bikî*
*Go ez hew dihêlim,*
*Ti Rihanka çavşîn,*
*Ber xwe ve bikî*

*Go Rihankê ba kiriyê:*
*Go diyarê çepikê wê bi noka,*
*Go Mecîdo keko bavê Qumrikê nekuje,*
*Hê biçûk e, hê zarok e*
*Go wada Xwedê li canê mi ketiye,*
*Ezê diwazdeh zêrên Memhmûdî,*
*Ji te re kime quloka*

*Go ew navbera bi dar û biya,*
*Go qeletûna Hemê,*
*Teştek nanê hilatî ye,*
*Go kevrê wî yê piçûk,*
*Weke weqiya*
*Go Rihankê, go wêylê,*
*Mi b'xulama bejna bi rîşiya*
*Go hay ji xwe hebe*
*Tu xwe nekî nav lepê ti Rûmiya*

*Go Hemê ba kiriyê:*
*Go di dilê min de hayê,*
*Mecîdo bavê Menîcayê,*
*Dikê û nakê,*
*Qerh û tebata wî,*
*Di kozika şikêra şîn de nayê*
*Hemê weke Teyrê Birhana,*
*Xwe darayê;*
*Go serê vî rebenî,*
*Kire çi belayê*
*Go wala Îsikê*
*Dengê wî şerî,*
*Bê Bexdayê*

*Go dilê mi de hîna,*
*Hemê da kevira,*
*Xwe gihanda, Şikêra şîna*
*Hemê go Rihankê,*
*Sê denga di navê xwe da,*
*Ji min ra bilîlîna*

*Heta pelmêwa navbera a şîn a,*
*Tirhê wê şîrîn a*
*Hinavê mina tişîna,*
*Sed mêrê mala hevikê,*
*Bi çaplî werê,*
*Mî mineta şerê wa tjnîna*

*Go li Derî Holê, Derî Holê,*
*Go va xweşmêra hevdu bi teqla*
*Qulibandina alê Bere Sorê;*
*Weke heft dewletê ecnebî,*
*Bikevine Boxaza Stembolê*

*Go ew navbera bi sûsa,*
*Go Hemê go Rihankê,*
*Sê denga ji min re bilîlîne,*
*Go ez im kekê Mûsa,*
*Hezar mêr ji mala Heikê,*
*Werê min,*
*Ezê wan vegerînim,*
*Bê namîsa*

*Go hêva mêva*
*Hemê û Mecîdo*
*Bi teqla hevdu,*
*Qulibandina alê çepikê,*
*Nav gutla sêva*

*Go Rihankê ba kiriyê,*
*Go wa Sofî Hacî, wa Sofî Hacî,*
*Go were li nav rezê me,*
*Bûye Kurmancî,*
*Go Sofî Hecî heyrano,*
*Go tu werê pêva,*
*Go weleh tu bikêr nayê,*
*Lê xebereke bi dêva*

*Go Sofî Hacî go;*
*Dilê mi da hiya,*
*Go dîska ava min a şîrîn fûriya*
*Elba mewîja,*
*Li bajarê werdegolê,*
*Pênc Mecîdiya;*
*Go kerê mi,*
*Kire diya Êzdarya*
*Mi îşê min ji wan çi ye?*

Têbinî: Kesê ku ji me re ev stran şandiye navê xwe nenivîsiye..

## Gotinên pêşiyan

- Beq nequre, wê bidire.
- Ber siya rovî de nebe, bila şêr te bixwe.
- Bide netirse, bitirse şerm neke.
- Bila mirov bi xwe xwedî rûmet be, ne di bin siya yê birûmet de be.
- Bizin bizin e, berê ciyê xwe pêkol dike, pey re mexel dibe.
- Çelikên guran, ji mirov re nabin bira.
- Çiyayê bê gul, mirovê bê dil, her du jî yek in.

## NIFIR

**Herêm: Botan**

* Xwîna te li eniya min bikeve
* Belqityo
* Ava vexwarinê negihêje ser te
* Tu negihêjî malê
* Tu bi qurbana serê wî tîfalî buya
* Agir bi mala te keve
* Agir bi mitêla keto
* Ma bayê şîn ketiye destê te
* Rîşa şîn di destê te de be
* Alifê bavê de bizê
* Xwedê yeka te neke dudu
* Emrê te qut bibe
* Tu biqurmiçî
* Miradê te qut bibe
* Hesretê te bişkê
* Rêviyê te bi guleyan re here
* Kurm û kêzik bi can keto
* Jin bi xelqê ve mawo
* Tu bi qurbana gedê me emero bî
* Çavê te birije
* Bayê sor bi destê te keve
* Nalet li te bê
* Çîpik di desta keto
* Mal mîratê bigere
* Emrê te emrê şivanokê be
* Emrê te emrê kelengê be
* Maşale tu kaf û kum bibe
* Îşala tu têr nexî
* Qismetê te li ser pişta xezalê bî
* Ji te û milkê milkê te re nemîne
* Guleya Heso li te keto
* Xwedê te gurî bike
* Roj li te nehere ava
* Stêrke te negihêje ezmanê heftan
* Mar bi te vede
* Tu vekevî û ranebî
* Mala te ne ava be
* Rîşa ber nuxum li te bê
* Jan tê ketino tenefir nemano
* Meytê te li ber tava havînê genî bibe
* Top lê ketno
* Stû firyawo
* Stêrka te li ezmana hilato
* Bêvil li axê keto
* Bêmirad çûyo
* Tu negihêjî malê
* Tu li qapiyan mawo
* Xwedê ji te re nehişto
* A xwuzî tê de mawo
* Îdî ser te de nehişto
* Kezeb di deva re derketo
* Xwedê nehişto
* Xwêde teala ruh ji me stendo
* Kurm di serî keto
* Brûska ezmanê heftan lê keto
* Tu beqa nekî
* Meytê te bi tehta ve bizeliqe
* Heymal jê mawo
* Kevir li wê bibare
* Deriyê te mor bibe
* Tu herû û venegerî
* Ziman golik di dev de hato
* Tu bimirî
* Tu ji erdê ranebî

Berhevkar: FÎKRET NALÇÊXANÎ

www.arsivakurd.org

## *Du kovarên Çandî û Lêkolînî bakurê Welêt derketin:*

# Jiyana Rewşen û War


Hejmara 21. ya kovara Jiyana Rewşen derket. Di vê hejmarê de dîsa pexşeneke Nuray Şen a bi sernavê " Evîn tîr dibe, dibe name" cih digire. Her wiha Şen bi sernavê "Sema" helbestek li ser Sema Yüce nivîsiye.

Di vê hejmarê de nivîsên der barê Osman Sebrî de jî balê dikşînin. Berhîm Paşa di nivîsa xwe de çewtiya hin agahiyên li ser jiyana Osman Sebrî diyar dike. Rûxweşê Zîwer jî di nivîsa xwe de li ser piralîbûna Osman Sebrî rawestiyaye.

Feqî Huseyn Sağnıç jî dîsa jiyana kesayetiyekî kurd daye ber ronahiyê. Vê carê Sağnıç li ser jiyana Xelîfê Yusiv nivîsek darêjtiye.


Gabar Çiyan dîsa sebaret bi aşûriyan nivîsek amade kiriye. Di vê nivîsê de hevpeyvîna digel keşeyê aşûrî Gabriel Işık jî cih digire. Di vê hejmarê de beşa duyem a nivîsa Cemil Denli ya bi navê "Ji lênûska biçûkêd kurdan" jî hatiye weşandin.

Wekî helbestan jî di vê hejmarê de helbesta Kawa Nemir ya bi sernavê "Selpakfiroş" balê dikşîne. Nemir helbesta xwe li ser jiyanan zarokên kurd ên ku li navçeya Stenbolê Beyoğluyê selpakfiroşiyê dikin, ristiye. Her wiha wergera helbesta Louis Aragon a navdar "Evîna Bextewer nîn e" jî berbiçav dibe. Helbest Cemil Denli ji frensî bo kurdî wergerandiye. Di vê hejmarê de her wiha helbestên Nihat Çelik, Hozanê Dilzar, Mîraz Pîranî, Dost Çiyayî, Nesîm Kasırga jî hatine weşandin.




Har-bi Soylu jî bi sernavê "Li Quntara Sîpanê Sê Lehehg: Rûbar, Xelîl, Dijwar" serpêhatiyek nivîsiye. Dîsa Ehmed Xeyrî jî bi kurteçîroka bi sernavê" Bapîrê Min" di vê hejmarê de cih girtiye. Şêxo Siyasur jî di nivîsa xwe ya dimilkî de bi mînakekê behsa fablê kiriye. Ji bilî van, çîroka bi navê Eliyê Daman Begê jî cih digire.

Li aliyê din hejmara 4. a kovara demsalî Warê jî derçû. Di hejmara Warê de nivîs û helbestên li ser Evdirehman Uça-




man berbiçav dibin. Uçaman vê berî demekê ji ber qazaya trafîkê jiyana xwe dest dabû. Di vê hejmarê de Kaleciwan li ser jiyan û ronakbîriya Uçaman nivîsek nivîsiye. Dîsa bi sernavê "İnsan û Dîn" û "Meal" du nivîsên Evdirehman Uçaman hatine weşandin. Nivîsa duyem beşek ji wergera Quranı Kerîm ya bo kurdî ye.

Di vê hejmara Warê nivîsa Martin Van Bruinessen a bi sernavê "Hacı Bektaş Hala Sultan Sahak İken (Ku Hacı Bektaş hîna Sultan Sahak e)" hêjayî xwendinê ye. Bruinessen, di vê nivîsê de li ser têkiliya mezheba ehl-î halk, elewîtî û bektaşîtiyê nirxandinên balkêş kirine. Dîsa nivîsa rexneyî ya Remezan Alan ku li ser kurteçîrokên Suzan Samancı ye, hêjayî xwendinê ye. Di vê nivîsa bi navê " Deq, hêvî û rexnegirtin" de, Alan bi mînakên ku ji kurteçîrokên Samancı wergirtiye, nivîskariya Samancı nirxandiye. Bi baweriya Remezan Alan, kurteçîrokên Samancı di warê çavdêrî, ziman û şayesandina kesayetiyan ve şikestî ne. Her wiha Alan girîngiya bi kurdî nivîsandinê berbiçav kiriye û ev ji bo Samancı jî destnîşan kiriye.

Her wiha nivîsa Prof. Maruf Xeznedar ya bi sernavê "Zembilfiroşa Feqiyê Teyran" û nivîsa Mîkaîl Canpolat ya bi sernavê "Haci Qedrî Koyî" jî bi naveroka xwe balkêş in.

Ji bilî van nivîsan ev nivîs di vê hejmara Warê hatine belavkirin: Bengîn Amedî, "Lîstikên Temaşeyî yên Kurdan û Şano" M. Güneş, "Bîbliyografiya Kurdan: Bangek û gaveke Dilnizm", Abdureqîb Yûsif, "Hunerê Nexşê û Kolana Kurdî" Lokman Polat, "Kalê Rind", Ferheng-Vajname- 4

SERWÎSA ÇANDÊ

# Dagirkerî û Hovîtî

CELALETTİN YÖYLER



Ez dixwazim, di vê nivîsa xwe de, hovîtî û gemariya dagirkeriyê, bi zimanê Qur'anê binirxînim. Di dema pêximber Sultan Suleyman de, di navbera wî û Padîşahê Bajarê Sebeê, li welatê Yemenê (Belqîz), gotin û bigirkêşiyên nameyê têne kirinê. Suleyman Pêximber bi navgîna Efrîtên xwe yên cinî, nameyekê ji Belqîzê re rêdike û ji Belqîzê re dibêje: "Divê tu bêyî fermana min tevnegerî û werî welatê minê Qudsê û a peymana teslîmbûna min bipejrînî."

Li ser vê qewmînê, Belqîz mezin û şêwirmendên xwe, li hev dicivîne û ji wan re, nameya Sultan Suleyman dixwîne û dibêjê wan: "Gelo hûn li ser helwesta Sultan Suleyman çi difikirin?" Mezin û rûspîyên wê bi hev re yekser dibêjin: "Em jî, dewlet û xudanê hêzên mezin in. Dema ku Suleyman were ser welatê me, em ê li hember derkevin." Lê Belqîz wekî wan nafikire û dibêje: "Ez dizanim ku em bi leşkerên Suleyman nikarin. Divê ku ez herime welatê wî û pê re peymanê deynim. Lewre kesên padîşah û xudanên hêzên mezin û giran, dema ku bikevine welatekî, ew wî welatî kavil û wêran dikin. Hem jî xudan rûmet û qedir bilindên wî welatî bindest û sernigûn dikin. Wî welatî talan û tajan dikin." A ji bona vê ramana Belqîzê Xuda di Qur'an a pîroz de di Sureya Nemil de û di ayetên 33-34 de wiha dibêje: "(Jinekê ji bona wan wiha gotîye:) Bi rastî gava serok bikevine welatekî, wî welatî kavil dikin. Serfirazê wan sernigûn dikin." Erê! Me çawa gotiye wisa dikin. Ev rewşa dagirkeriya çepel, bi zimanê Qur'ana Xuda, dagirkerî neheqî, bêdadî û barbarî ye. Dagirkerî, dizî, talan, xwînrijandin, talan û şewat e. Dagirkerî! Lewitandina irz û namûsa xudanê cih û warê wî welatî ye. Dagirkerî bêxudatî û neheqiya herî mezin e, li ser rûyê cîhanê. Bi rastî wekî gotina Xuda di Qur'ana pîroz de, dagirker, ketine welatê me û me talan û tajan dikin. Li her deverê welêt, digel hevalbendên xwe û cerdevanê bênamûs, êrîşî ser namûs û irzê dayik û xwengên me dikin û dilewitînin.

Wekî çawa li Mûşê, li navçeya Melezgirtê, li gundê Nordînê, êrîşa cerdevan û caşê bêfedî Abdulkadir Erkoçaklı ser bûka belengaz a bi navê Hülya û lewitandina irz û rûmeta wê ya pîrektiyê. Ev bi tenê ne li vir, li gelek deverên cur bi cur ên Welêt bênamûsiyên dagirkeran, cerdevanan rûdidin. Gelî caş û cerdevanên bêfedî! Hûn bifikirin û xwe bixin şûna wan kesên ku hûn xerabiyê li keçik, bûk û pîrekên wan dikin. Dema kesekî bi keçik, li bûk û pîrek we xirabiyê bike, gelo wê wicdana we neşê? Lê bi zanîna min, kesên ku wekî we ne cerdevan û çaş in, ew keçik, bûk û pîrekên we, wekî keçik, dayik û bûkên xwe dibînin. Hem jî dema êrîşên bêhetikî li wan bê kirine, ew ê ji bona parastina namûsa wan xwe bidine kuştinê. Dagirkeran hûn xapandine. Hûn ji hemû nirxên mirovahî û neteweyî û musulmani yê bi dûr xistine. Hûn ketine nava gemariya berjewendîyên xwe yên rojane. Ew di hemû tiştên gemar de we didine xebitandin. Ew we bi hev didine kuştinê. We wekî rewira didine xebitandinê. Lê wê rojek were, wê we bavêjine ser sergo. Lewre di pêvajoya dîrokê de her tim wisa kirine.

Hem jî hûn baş bizanibin ku dinya bi dor e; geh li jêr e, geh li jor e. Hem jî çerxa felekê bavê kesî nîn e, bi xirabî ji bona tu kesî, hetanî dawiyê nagere. Heger berê gera vê çerxê îro di lehê gemarîya we de be jî, wê rojekê rast bizivire û bibe dijminê we. Hûn dê di gemariya kirinên xwe yên nemirovane û nexudayî de biperçiqin û bixeniqin.

Dîroka cîhanê her tim şahîdê van rastiyan e. Tu demê hêza xirabiyê bi ser neketiye. Çiqas bêbavî û gemarî kiribe jî têk çûye. Mirovahiyê, çiqas zordarî dîtibe jî, di talîyê de bi ser ketiye û bûye xudanê rûmetê.

Banga min li we, gelî kesên ku we dest ji mirovahiyê berdaye û hûn bi dijminê gelê xwe re ketine nav talan û tajanên gelê xwe û dest davêjine hetikandina namûsa wan, dest ji gemariyê berdin û bizivirine nav civaka xwenas û Xudanasan.

# "Cî — nema"

### Dilê min narê

Yekî ku mahdê wî (dilê wî) naçe xwarinê, ji bo vê yekê dihere ba bijîşk, jê re wiha dibêje:

–Tixtor beg, weleh benim kalbim yemeğe gitmiyor.

### Ser û pê

Yek dihere ba goştfiroş û dixwaze hûr û roviyan bikire, lê yê goştfiroş bi kurdî nizane, ew jî bi tirkî nizane, wiha dibêje:

– Bana bî tîlkî ve baş ver.

### Ba

Yekî ku ba di canê wî de heye, dihere ba bijîşk û dibêje:

– Tixtor beg, wele sirtima rûzgar gîrmîş.

### Deng

Yekî ku dengê wî ketiye û dihere ba bijîşk, jê re dibêje:

– Tixtor beg wele sesîm duşmîş! Bijîşk jî dibêje li ku ketiye here lê bigere.

### Bûk

Yekî ku bûkik di çavê wî de çêdibe, dihere nexweşxaneyê ji bijîşk re dibêje:

– Tixtor be gozim de gelîn çikmiş. Bijîşk jî dibêje:

– Git damadı getir.

### Cînema

Yekî ku dixwaze here sînemayê, dihere ber devê derî û li lewhayê dinêre ku "Cinema" dinivîsîne. Ew jî ji hevalê xwe re dibêje:

– Weleh, waye dibêje; 'cî nema", nexwe em vegerin malê.

### Cirifî

Yekî ku baş bi tirkî nizane golika xwe dibe ba baytar.

Baytar dibêje:

– Çiyê golika te heye?

Xwediyê golikê:

– Bêtar beg sen bizim golik
Ka vêriyorum yêmiyorsin
Ceh vêriyorum yêmiyorsin
Hema cirifî cirifî oliyorsun!

### Cardî jî

Yekî kurd dikeve parlemena tirkan û dibe wezîr.

Rojekê bi rê de dihere, lê her tim tekerê texsiya wî diteqe. Cara dawî bêhna wî teng dibe û dibêje:

– Car di jî teker patladî!

### Komposto

Yekî kurd dihere ba bijîşk. Bijîşk jê re dibêje, divê her tim tu "komposto" bixwî û jê re li ser reçeteyê dinivîse. Nexweş jî dihere ezcaxaneyê û reçeteyê dirêjî xebatkarê eczaxaneyê dike, xebatkar jî dibêje here aşxaneyê. Mêrik radibe diçe aşxaneyê, xebatkarê aşxaneyê kompostoyê tîne. Nexweş şaş dimîne û dibêje:

– Ev xoşava me çi demê bûye komposto?

### Eraq û hec


Yekî eraqxwir dihere hecê. Lê belê li wê derê jî karê xwe didomîne. Dema ku dihere tewafa kevir, lê serxweş e, yên dora wî jê dipirsin:

– Çima te eraq vexwariye? Yê eraqxwir wiha bersiva xwe dide:

– Ez nikarim li dor kevir bigerim, hêza min tuneye, îcar min eraq vexwar ji bo ku kevir li dor min bizîvire.

Berhevkar: ÇIYA MAZÎ

## BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (128) XAÇEPIRSA




**Bersiva Xaçepirsa 126'an**


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin destê me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 128'an kaseta Koma Dengê Azadî, 'Aştî' ye.

**Jêrenot:**

*Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.*




**Pênc kesên ku xelata hejmara 126'an kaseta Aram 'Ax dilê' qezenc kirine: Abdurrahman Özgüç/Edene, Murat Güzel/ Amed, Mehmet Gönül/ Êlih, Îdris Doğan/ Amed, Murat Yapıştıran/ Mêrdîn.**



*Dewlet erdê ke sera 1954 kerdî vila, awa peyser gena û dana hetkaranê xo*

# Wayirê erd biyayinê mûxalîfan zeraro

**Şaro ke wayirê nê şertan niyo, dewleta erdanê înan ci dest ra gena û dana koruciyan, fasîştan û malbatanê dewlemendan. Rîdê nê şertana, şarê Serê Kanî bî maxdûrî û dewlet dê mahkama. Êkê erdî ci dest ra girotyayê, kesê ke şertê ke cor de nûsyayê wayirê, ê şertan ê.**

Vatenê ke serdarê dewleta tirkê, çend serî yo qandê şarê Ruha anê ziwan, iyê zûrî vejiyenê. Ze ke yeno zanayin, serdarê dewleta tirkê taybetî jî, nê çend seranê peyinan de tim û tim vanê şarê Ruha tengîn ra xelsiyay û kewtî herayin. Nê qisey û vatenî projeyê GAP'î werte vejyayin peyra verî ra bî vêşî. Çend mengan de finê, serdarê dewleta tirkê nameyê merasîmê akerdina GAP'î de şinê Ruha û a saet de çiçî yeno ci fek vanê. Jû kişt, yan jî jew keverê GAP'î yo qediyeno, serdarê dewleta tirkê hema merasîmê akerdin virazenê û zaf zaf zûrî çekenê. La belê kerdenê ke, ewro şarê Ruha rê, taybetî jî şarê Serê Kanî rê virazyay, înan ra wastenê dewleta tirkê rind vînayenê.

Dewleta tirk sera 1954 de nameyê "Projeyê Reformê Erd" de, jew proje kerd hedre. Çoşmeyê nê projey de komîsyonî nay ro. Komîsyono verîn Sûka Ruha Serê Kanî (Ceylanpınar) de niya ro. Nê komîsyonî sera verîn Serê Kanî de nezdiyê, new hezar hektar erd kerd vila. Şarê Serê Kanî yê nezdiyê hîris û panj, çewres serî yo nê erdan karenê.

Dewlet wexto erdî kerdê vila, cayanê dûrîyan ra dayê şarî. Qandê dûrî de biyayin jî karitinê erdan zahmet biyo û coka şarî mabenê xo de, erdî teqesê pêjewînan kerdê. La belê winakerdin ser; na fin dewlet sera 1981 de, jew qanûno newe veto û nê qanûniya teqeskerdina erdan qedexe (yasak) kerdo. Sera 1991'în de fina jew qanûn vet û raya nê qanûniya erdê ke sera 1954 de kerdi vila, peyser girot. Hetanî 1991 şert û mertê dewlet çinêbi, la belê 1991 pey ra qandê erdan peysergirotin newe newe şertî vetî werte. Şertê ke awa wayiranê nê erdan de geyrena û wazena wina yê:


*1. Zanayina wenden û nûstin ê tirkî*
*2. Mûxalîfê dewlet nêbê.*
*3. Mesela ci na eskerî çinêbo.*
*4. Sînorê kokimîn (pîrîn) meravêrê.*



Şaro ke wayirê nê şertan niyo dewleta erdanê înan ci dest ra gena û dana koruciyan, faşîstan û malbatanê dewlemendan. Rîdê nê şertana şarê Serê Kanî bî maxdûrî û dewlet dê mahkama. Êkê erdî ci dest ra girotyayê, giranî kesê ke şertê ke cor de nûsyayê wayirê ê şertan ê. Giranî jî serdar, endam û raydayoxê Partiya Demokrasiya Şarî HADEP'ê. Coka serdar, endam û raydayoxanê HADEP ra Ahmet Dağtekin, MahmutDağtekin, Bozan Dağtekin, Abdulkadir Fırat, Emin Şengül, Abdo Demir, Hacı Tuncel, Hüseyin İlhan û Aziz İlhanî dewlet dê mahkama. Mahkameya İdareya Entepî no hefte biryarê xo da. Biryar de wina vajyeno: "Wayirê erdanbiyayina nê kesan, qandê herêm rind niyo". Mahkama biryaro winayîn dayina maxdûrîna nê kesan tescîl kerd. Erd ci dest girotyayan ra, Abdulkadir Fırat biryarê mahkama ser vat: "Nê biryarî ra oyo ayseno, kerdenê ke şarê kurd sero virazyenê Projeyê Reformî jî leteyê nê polîtîkanê lîminan o. Mahkama nê biryarê xo ya awa wazene mûxalîfan mahkûmê veyşanîn kiro. Dewleta heveyan rast ra rast dewan dê cira qewnena, heveyan jî erdan ci dest ra girotina wazena herêm ra dûrî-fino". Fıratî qiseyê xo wina dewam kerdî: "Mahkamawa vana nê kesê wayirê erdan biyayin qandê herêm zerar o? Ezo mahkama ra pers kena. Çira mendin û wayirê ard biyayin qandê herêm zerar o? Ma çete na ro, yan jî ma yê eroyîn û esrar karem/roşemî". Goreyê vatena Fıratî iyê biryarê mahkama berê mahkameya berzîn, ek wija jî haqê xo megirê mayê dahwa berê Ewropa û dewleta tirk bidê Komisyonê Haqê Mardiman ê Ewropa.

NAVENDA NÛÇEYAN

---



**MEHMET ADIR**

**(ÇEKDAR) 16.07.1989**

**ZANA**
**CIMŞÎT**
**FERHAT**
**MEDYA**

*Dîsa dîsa Cizîra Botan*
*Serî hildide ber bi jor*
*Rengê xwe sor dike*
*Ji xwîna lawên xwe*

*Belê hevalên qehreman*
*Wek Çekdar û Felat*
*Wek Çekdar, Cîmşît, Ferhat, Zana û Medya*
*Belê hevalên tolhildan*

*Gelê kurd soz dide*
*Nahêlin çeka we li erdê bimîne*
*Û xwîna we sor bibe.*



**ABDURAHIM ADIR**

**(ÇEKDAR) 01.08.1992**

Belê hevalên nemir. Di şexsiyeta we de tevayî hemû şehîdên şoreşê em bejna xwe li ber we ditewînin û em dibêjin, riya we riya me ye. Soza we soza me ye.

**KADRİYE, JIYAN, XEMGIRÎN**


Azadiya WELAT

ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yerî
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308 Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212) 251 79 37–251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerînendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

■ NÛNERÎTIYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

■ Mêrsîn
Tel: 0 (324) 233 83 96

■ Îzmîr
Tel: 0 (232) 425 37 02

Munchen:
(Nûnerê Giştî yê Ewrûpayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Swîsre:
İhsan Kurt
Tel–fax
41 21 652 76 07

■ Hollanda:
S. A. Fewzî
31 104 85 55 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helîm Yûsiv


www.arsivakurdi.org

